

## 'Hûn careke din werin emê we bikujin'

✓ Heyeta alman a ku beriya mehekê li Kurdistanê geriyan û di dema gerê de serê wan bi polîsan re kete belayê, piştî ku vegeriyan Almaniyayê, civînek li dar xistin. Di civînê de li ser tehdeyên ku polîsan bi wan kiriye, sekînin û dan zanîn ku polîsên tirk ew bi kuştinê tehdît kirine. Ev heyet ji endamên Komîteya Kurdistan Solidaritet û Sendikaya Karkeran pêk tê.

Rûpel 8-9



## Yaşar Kaya: Kurd û tirk dikarin bi hev re bijîn

Parlementoya Kurdistanê ya li Derve, bi têkiliyên siyasî û diplomatîk her diçe berê xwe firehtir dike û girîngiya çareserkirina pirsgirêka kurdî bi dewletên rojavayî dide fêmkirin. Heftiya çûyî Serokê PKD'ê Kaya, ji bo pêkanîna hin hevdiyan û têkiliyên bi parlementer û sazîyên demokratîk re, çû Swêdê.

Rûpel 2

## Yaşar Kemal: Tirkiye ji bo me bûye zindan

Şewitandina daristanan ne rast e? Ji ber vê yekê gelo mafê min nîn e ku ez dewletê sûcdar bikim? Wekî din gelo hemû dinyayê 1800 cinayetên "kiryar nediyar" (faîlî meçhûl) nebihîst, rojname nenivîsandin? Tirkiye wekî dewleta îşkenceker a herî mezin nehate ragihandin? Wekî bayeke bijehr û zalim bi ser gel ve neçû?

Rûpel 16

## 'Me mirov ji balefiran diavêtin behrê'

Li Arjantinê piştî Fermandarê Giştî yê Artêşa Arjantinê, roja 4'ê gulanê ferman-darên hêzên hewayî û behrê, bi awayekî fermî daxuyandin ku wan di dema rêveberiya leşkeriyê de li dijî hêzên çepgir azîneyên qirêjî meşandine.

Rûpel 5

# Welatê Me

ROJNAMEYA HEFTEYÎ

SAL: 1 HEJMAR: 26

14 GULAN 1995

BUHA:40.000 TL(KDVD)



Tewra dewletên rojavayî li hemberî PKK'ê diguhere. Li gorî gelek dewletên rojavayî:

## 'PKK HÊZEKE SIYASÎ Û ALIYEKÎ ŞER E'



Piştî Xelata Rozayê Leyla Zana layiqî Xelata 'Aachen'ê ji hate dîtin

## Ber bi Nobelê ve...

Rûpel 3

✓ Êdî rojava ji PKK'ê wekî terefekî şer dihesibîne û qebûl dikin ku PKK hêzeke kurdistanî ye û ji bo mafên neteweyî mûcadeleyê dike. Ji xeynî gelek rêxistin û sazîyên demokratîk ên rojavayî, niha ji di sewiyeya dewletî de hêdî hêdî nûnerên sazîyên ewrûpî tewra xwe ya li hemberî PKK'ê diguherînin û êdî bi giştî PKK'ê wekî rêxistineke terorîst bi nav nakin.

✓ Heyeta Rêxistina Ewlehî û Hekariyê ya Ewropayê (REHE) di bin serokatiya Willy Wimmer de heftiya çûyî hate Tirkiyeyê û di dema gera xwe ya Tirkiyeyê de li Kurdistanê ji gerek pêk anîn. Vê heyetê, ji bilî şîrove û beyanatên resmî li hin cihên din tiştên balkêş gotin.

Rûpel 2

Tewra dewletên rojavayî li hemberî PKK'ê diguhere. Li gorî gelek dewletên rojavayî:

# 'PKK HÊZEKE SIYASÎ Û ALIYEKÎ ŞER E'

Êdî rojava jî PKK'ê wek terefekî şer dihesibîne û rasterast neyê gotin jî, tê qebûlkirin ku PKK, rêxistineke kurdistanî ye û ji bo mafên neteweyî mucadeleyê dike. Ji xeynî gelek rêxistin û sazîyên demokratîk ên rojavayî, niha jî di sewiyeya dewletî de hêdî hêdî nûnerên sazîyên ewrûpî tewra xwe ya li hemberî PKK'ê diguherînin û êdî bi giştî PKK'ê wekî rêxistineke terorîst bi nav nakin. Heyeta Rêxistina Ewlehî û Hêvkarî li Ewrûpa, REHE di bin serokatiya Willy Wimmer de heftaya çuyî hate Tirkîyeyê û di dema gera xwe ya Tirkîyeyê de li Kurdistanê jî gerek pêk anîn.

Di nav heftaya borî de heyetek Rêxistina Ewlehî û Hêvkarî li Ewrûpa (REHE) hate Tirkîyeyê. Çapemeniya Tirkîyeyê, gelek caran hatina heyetên wiha û gerên wan nanivîsînin jî. Gera heyeta REHE'yê ku di bin serokatiya Willy Wimmer de çêbû, ne ji "skandalê" bûya, dîsa kesî (çapemeniyê) qala wê nedikir. Li gorî îdiayên hin derdorên kurd (Şerafettîn Elçî û Feridun Yazar) wezaretê derve ya Tirkîyeyê rê li ber hevdiştina wan û vî heyetê girtiye û li gorî wan, di bernameya heyetê de hevdiştina bi wan re jî hebû. Lê ev îdia ji aliyê rayedarên hikûmetê ve nehat qebûlkirin.

## Heyeta REHE'yê li Kurdistanê

Ji hêla din hevdiştin û gera vî heyetê jî du aliyên ve dikare bê nixandî. Yek ji van di çapemeniyê de (rojnameya Cumhuriyet, Nizamettin Kaplan, 5 gulan 1995-roja îne) diyar bû. Li gorî mu-

xabîrê Cumhuriyetê Nizamettin Kaplan serokê heyeta REHE'yê li Diyarbekirê di brîfînga ku Walyê Herêma Awarte Ünal Erkan daye de ev pirs kiriyê: "Ji hejmarê kesên mirî jî xuya dibe ku di bîngeha meseleyê de îdeolojiyêke polîtîk heyê. Gelo ev însanan çima radîhêjin sîlehê (çêkê), li gorî we (Ünal Erkan) ev mesele hatiye çareserîkirin (halkirin)?" Bersiva Ünal Erkan wiha bû: "PKK li ser navê kurdan, wan dîkuje. Armanca PKK'ê perçekirina Tirkîyeyê ye. Em bi hev re îro li bajêr gerîyan, ma hemwelatîyêkî derket got ku problema min bi dewletê re heyê?"

Li ser vî bersivê Willy Wimmer got ku "me bersiva pîrsa xwe nestand." Li gorî Wimmer PKK, "terorê" jî bo armancên xwe yê siyasî wek rîyekê (wasitîyê) bi kar tîne. Şîroveya vî gotinê ev e: PKK ne rêxistineke "terorîst" e. Rasterast neyê gotin jî, tê qebûlki-



rin ku PKK, rêxistineke Kurdistanî ye û ji bo mafên neteweyî mucadeleyê dike.

## "Muxatabê dewleta tirk PKK ye"

Di gera heyeta REHE'yê de ew tiştên bi awayên vekirî negotî ku di çapemeniyê de cih negirtin, çî bûn? Li gorî agahiyên ku me bidest xist, heyeta REHE'yê bi hin kesên din jî hevdiştin kirine.

Di van hevdiştinan de heyeta REHE'yê diyar kiriyê ku yekîtiya ewrûpa, naxwaze Tirkîyeyê têxe nav xwe û berpirsiyarê Tirkîyeyê jî vî dizanin. Li gorî heyetê, ji ber ku haya

Tirkîyeyê jî van tiştan heyê, ew guh nade qerarên ku rêxistinên ewrûpa standine. Di eynî hevdiştinan de hate gotin ku ew (REHE) PKK'ê muxatabî dewleta Tirkîyeyê dibînin û ji bo hevdu-naskirin û lihevdu-rûniştina wan ew jî bo navbentîyê dixebitin.


## Demirel: Rojava Sevrê dixwaze

Di van demên dawî de jî hin berpirsiyarên dewletê (Serokomar Süleyman Demirel jî di nav de) di beyanatên xwe de qala Peymana Sevrê kirin û gotin ku ewrûpa (rojawa) dixwaze yekîtiya Tirkîyeyê parçe bikin. Di eynî rojan de 19 balyozên

Tirkîye yê li ewrûpayê jî bo şewrê hatin Tirkîyeyê û li ser faalîyetên PKK'ê yê siyasî axivî. Di wê civînê de jî diyar bû ku wê di demê nêzîk de serê wan (Tirkîye) jî ber xebatên kurdan yê siyasî bi dewletên ewrûpî re têkeve derd û tevliheviyan.

Wekî tê zanîn, beriya mehekê dema ku artêşa tirk başûrê Kurdistanê îşxal kiribû, Rêxistina Xaç Sor a ku navenda wê li Cenevreyê ye jî Tirkîyeyê daxwaz kiribû ku ew li gorî qayideyên herbê, li hemberî gerîla şer bike û PKK'ê wekî aliyekî şer qebûl bike.

SUUT KILIÇ



Serokê PKD'ê Yaşar Kaya Li Swêdê bi gelek parlamenterên biyan re têkilî danîn

# 'Kurd û tirk dikarin bi hev re bijîn'

Serokê Parlamentoya Kurdistanê ya li Derveyî Swêlêt (PKD) Yaşar Kaya, li Swêdê hevdiştin û têkilî pêk anîn. Kaya bi parlamenterê partiyên siyasî û rojnamevanan re axivî û der heqê PKD'ê de agahî da wan.

Piştî hevdiştina endamên parlamentoyê Ali Yiğit û Remzi Kartal ku bi Serokê Meclîsa Parlamenteran a Konseya Ewrûpa Miguel Martinez re kiribûn, Serokê PKD'ê Yaşar Kaya jî di navbera 26'ê avrêlê û 1'ê gulanê de li Swêdê dest bi tîkiliyan kir. Kaya, li Swêdê di civîna Kluba PEN'ê de li ser pîrsîgîrêk û daxwazên kurdan û der heqê PKD'ê de axivî. Roja duduyan jî, rojnameya Swêdî Sverska Dagbladet (yek jî rojnameya herî mezin) bi Kaya re hevpeyvînek çêkir.

Di hevpeyvînê de Kaya got ku, ew dixwazin bi Tirkîyeyê re federasyonêkê damezirînin û di wê bawerîyê de ne ku

kurd û tirk hê jî dikarin bi hev re bijîn. Piştî hevpeyvînê Kaya hevdiştina xwe ya yekemîn bi Sekreterê Navneteweyî ya Partiya Sosyal Demokrat Conny Frederikson re kir. Di hevdiştinê de Kaya, der barê PKD'ê agahî da û got ku PKD, sazîyêke plural a demokratîk e û daxwazên gelê kurd tîne zimên. Kaya, diyar kir ku wan jî rêxistinên kurd re, yê ku hê di parlamentoyê de cih negirtine jî kontenjan veqetandine.

Yaşar Kaya piştî Frederikson bi parlamenterê Partiya Sosyal Demokrat û Serokê Delegasyona Rêxistina Ewlehî û Hêvkarî ya li Ewrûpayê (REHE) Kristîna Svensson re jî hevdiştinek kir. Di hevdiştinê de Kaya û Svensson li ser rewşa Tirkîye û Kurdistanê sekinî û biryarên Konseya Ewrûpayê yê li dijî Tirkîyeyê nixandî. Kaya, di hevdiştinê de der heqê PKD'ê de agahiyên dorfireh dan Svensson.

Serokê PKD'ê Yaşar Kaya, hevdiştina xwe ya sêyemîn jî bi parlamenterê Partiya Konservatîf (partiyêke muhafazakar e) û serokê Komîteya Kurd a Parlamentoya Swêdê Van Essen û Parlamenterê Partiya Sosyal Demokrat û endamê Delegasyona REHE'yê Urban Ahlin re kir.

Kaya, bi Van Essen û Ahlin re li parlamentoyê axivî û diyar kir ku Essen û Ahlin di cejna Paskalya da çûne Kurdistanê Başûr û di îşxalê de şîrkîya Partiya Demokrat a Kurdistanê û artêşa tirk bi çavên xwe dîtine. Di hevdiştinê de Kaya pîrsa Van Essen ya li ser "şerê birakujîyê" yê di navbera PDK'ê û YNK'ê de çêbû, bersivand û li ser şer ev got: "Ev şerê ku di navbera PDK'ê û YNK'ê de çêdibe, li pêşberî çavê raya giştî ya dinyayê zîrarê dide îmajê yekîtiya kurdan."

Navenda Nûçeyan

\*"TC" Her diçe fekiliyên xwe yê bi dinyayê xera dike...



## Piştî Xelata Rozayê Leyla Zana layiqî Xelata 'Aachen'ê jî hate dîtin Mebûsa kurd Leyla Zana ber bi Nobelê ve...

Mebûsa kurd a Partiya Demokrasiyê (DEP) Leyla Zana ku niha di Girtîgeha Enqereyê de ye, piştî "Xelata Rozayê" vê carê jî ji aliyê "Cemiyeta Xelata Aştiyê" (Aachener Frieden Spreis Verein) ve layiqê xelatek din a aştîyê "Aachen" hate dîtin. Cemiyet her sal xelatê dide kesekî hemwelatîyê

xwe û kesekî navneteweyî. Îsal cemiyetê qerar da ku xelata navneteweyî bidin Leyla Zana û ya neteweyî jî bidin Ludwig Baumann, yek ji wan kesên ku bûbû qurbanê Naziyan. Li gorî agahiyên ku Serokê Cemiyeta Xelata Aştiyê ya Aachen Albrecht Bausch da, îsal di şaxa navneteweyî de 7 berendam hatine nîşandan û

heyeta kargerîya cemiyetê, hejmara berendam daxistiye 4'an. Serok Albrecht Bausch dide zanîn ku, wan ev çar berendam pêşkêşî civîna nûneran kirine û di civîna nûneran de nûnerê cemiyetê jî sedî heştê rayên (dengên) xwe dane Leyla Zana û ew layiqî xelatê dîtine. Serokê cemiyetê Al-

brecht Bausch sebebê xelatkirina Zana wiha şîrove kir: "Sembola Hereketa Demokrasiyê ya Kurdan e. Ew jî bo aştîyê ketiye rîska ferdî û xwedî cesareteke mendî ye." Wê xelata Zana di 1'ê rezberê de bi merasîmê bê dayîn. Navenda Nûçeyan

## Îşkenceyên ku li zarokan tên kirin her diçe zêde dibin Li belavkarê rojnameya me îşkenceya polîsan

Belavkarê rojnameya me Ş.A (12) û E.P (12) jî aliyê polîsên Edeneyê ve hatin girtin û li emnîyetê hatin îşkencekirin. Li gorî gotina belavkaran, ew di 9'ê mehê de ji bo belavkirina rojnameyê li "Bazara Bîtê" a li taxa Karasuyê ji aliyê polîsan ve hatine binçavkirin û polîsan dest danîn ser 90 heb rojnameyan jî. Polîs piştî binçavkirinê, belavkarê me Ş.A û E.P rojekê li qereqola Hacı Bayramê digrin. Li gorî gotina belavkaran, polîsan li qereqolê îşkence bi wan kirine û di laşê wan de çixare vemirandine. Di îşkenceyê de jî ji wan re ev hatiye gotin: "Hûn tev ermenî ne, hûn milîs in." Belavkar, ji bilî vê rojê du rojan jî li navenda emnîyeta bajêr binçav dimînin û li wir jî tade û îşkence li wan tê kirin, polîs nahêlin tu tiştê xwarin û vexwarinê bistînin. Li gorî gotina be-

lavkaran, polîsan dengê kesên di îşkenceyê de bi wan dane guhdarkirin û demançe xistine serê wan û ji wan re gotine, "Careke din rojnameyê nefiroşin." Tê zanîn ku berê jî taxa li Gülbahçe û Şakirpaşa jî belavkarê me hatibûn binçavkirin û bi mirinê hatibûn tehdîtkirin. Di laşê wê de çixare tefandin. Li Taxa Fevzîpaşayê ya Edeneyê, di 4'ê gulanê de keçikeke 11 salî (R.Ü) li emnîyetê ji aliyê polîsan ve hate îşkencekirin. Keçeke kurd di 4'ê gulanê de piştî êrîşa polîsan, li mala bavê xwe bi dê û meta xwe re tê binçavkirin. Di dema binçavkirinê de keçika 11 salî bi tecawizkirinê tê tehdîtkirin, di canê wê de çixare tê vemirandin û wê didin elektrîkê. Li ser vê bûyerê Serokê Komelaya Mafên Mirovan

(IHD) a E-denê Metin Çelik, beyanatek da û îşkencekirina keçikê lanet anî. Di 6'ê gulanê de IHD'ya Edeneyê jî bo çapemeniyê civîna çekir û li wir R.Ü qala îşkenceya lê kirine, kir: "Di laşê min de çixare tefandin. Pirs hinek kesan dikirin û navê wan ji me dixwestin. Pişt re jî gotin ku tu, navê wan kesan nedî, wê hevaleyê me tecawizî te bike. Pişt re jî wê 20 kesên din jî tecawizî te bi-

kin. Piştî 3 rojan wan ez berdand, lê meta min hê jî di bin çav de ye û îşkence lê tê kirin." Welatê Me / Edene



## KURTENÜÇE...KURT

### Terora cerdevanan nasekine

Li Mêrdînê, li gundê Misqeynterê Lku li ser navçeya Qoserê (Kızıltepe) ye, muxtar û sercerdevan Mahmut Gümüş bi cerdevanên gundê Mîlan û jendirmeyên Qereqola Qoserê re, bi ser malan ve digirin. Roja 1'ê gulanê sercerdevan Mahmut Gümüş bi alîkariya cerdevanên Mîlan û jendirmeyên Qoserê re, girtin ser mala Şêxmus İlhan. Cerdevanan zarokên malê Mahmut, Zeynettin û neviyê malê Mehmet İlhan revandin. Cerdevan ji bo berdana zarokan, ji malbatê 45 milyon lîrayên tirk dixwazin.

Welatê Me / Qoser

### Rojnamevanê berdayî: Şemo sax e

Gerflayên ARGK'ê 1'ê gulanê de Griya Dersim û Pêrtaxê birîn û qontrola nasnameyan kirin. Di kontrola nasnameyan de gerflayên muxabîrê Reuters û BBC'yê Ferît Demir û 4 karmend bi xwe re birin. Piştî demekî gerflayan 4 karmend berdand. Ji bo pirsîyariyê rojnamevan bernedand. Roja 8'ê gulanê gerflayên ARGK'ê rojnamevan Ferît Demir li nêzîkî Dersimê berdand. Demir daxuand ku gerflayan lê tu tadeyî nekiriye ew bi qumandarê ARGK'ê Şemdîn Sakîk re jî axiviye.

Navenda Nûçeyan

### YRWK'ê birakuji mahkûm kir

Di roja 27.4.1995'an de li Berlînê semînerê agahdariyê ji aliyê YRWK'ê ve hate çêkirin. Beşdarên semînerê li ser doza welat bi tevayî û nemaze li ser rewşa Kurdistanê Başûr peyivîn û bîrûbaweriyên xwe der barê Yekîtiya Neteweyîya Demokrat a Kurdistanê (YNDK) de anîne ziman. Beşdarên semînerê şerê birakujiyê yê di navbera PDK'ê û YNK'ê de bi tûndî mehkûm kirin. Hate gotin ku li şûna birakujiyê hemû hêzên welatparêz li pêşîya êrîşên dijminên neteweya kurd, çî li Başûr û çî li Bakur, bibin yek.

Welatê Me/ Berlîn

### Li Pîlêmorî 21 leşker mirin

Li navçeya Dêrsimê Pîlêmorî (Perlek) operasyona hêzên artêşa tirk didome û di navbera gerfla û leşkeran de şerên dijwar diqewimîn. Roja 5'ê gulanê li çola Pîlêmorîyê gerfla û leşkeran li hev dan. Di vê qewmîne de gerflayan li gelek cihan leşker xistin kemînen xwe û êrîşê ser wan kirin. Şer ji sibê heta êvarê û bi awayekî dijwar dewam kir. Di encama vê qewmîne de 21 leşker û 11 gerfla mirin.

Welatê Me / Dêrsim

Navên 10 kesên ku di xaçepirsa hejmara 24'an de peyva veşarî "Stranbêj" dîtine û pirtûka "Gotinên Navdaran" qezenc kirine:

**Cemil Oğuz Amed**

Ibrahim Altunışık Êlih

**Ferhat Can Sêrt**

Herunê Piçuk Midyad/Mêrdîn

**A. Timur Buca/İzmir**

Yıldız Çiçek Bayraklı/İzmir

**İrfan Turan Karşiyaka/İzmir**

Abdurrahman Kapazan / İzmir

**Dilan Selçuk Antakya/Hatay**

Belma Sağniç Çinar/Amed



## 10 hezar mamoste meşîyan

Nêzîkî 10 hezar mamoste ji bo sekinandina pest û surgunan di 7'ê gulanê de li Enqereyê meşîyan. Mamosteyan şevqê zû li kolana Sihhiyeyê civiyayan û saet li derdora 11'an ber bi aliyê Wezaretê Peywerdehiyê ve dest bi meşê kirin. Mamosteyan di meşê de sloganên wekî, "Surgun û ceza bila rabin, Sendî-

ka mafê me ye, grev çeka me ye." û hwd. avêtin. Di meşê de pankartên bi nivîsên, "Qir-kirina karmendan bila bisekine û Sendikaya bi grev û peymanê tomerî" bal kişandin. Xebatkarên dezgehên dewletê yên endamên sendikayên din jî, di meşê de cih girtin û pişt dane mamosteyan.

Navenda Nûçeyan

## Li gorî rapora Rêxistina Rojnamegerên Sînornenas;

### 103 rojnameger hatin kuştin

Rojnamegerên Sînornenas rapora xwe ya li ser sala 1994'an weşand, li gorî wê raporê di sala 1994'an de 103 rojnameger hatine kuştin. Rapor sala çûyî jî bo rojnamegeran wekî saleke pir xerab bi navdike û dibêje li hemû welatên ku endamên Nete- weyên Yekbûyî ne, rojnameger rastî girtin, sansûr û kuştinan hatine. Li

gorî raporê, tenê li 50 dewletên endamê NY'ê azadiya xwefadekirinê heye. Tê gotin ku sala çûyî li Rwendayê 48 rojnameger hatine kuştin. Rapor dide zanîn ku li Cezayîrê jî gulana 1993'yan heta dawiya sala çûyî 35, li Bosnayê jî di nava salekê de 8 rojnameger hatine kuştin.

Di sala li gorî raporê 98 rojnameger jî ber fikrên

xwe niha li pişt deriyê hesin in. 19 heb jî wan li Çînê ne. Tê gotin ku ji meha rêbendanê ve 16 rojnamevan hatine kuştin. Rapor rojnamegeriyê li Kosova, Tîmor, welatên rojhilatê Ewropayê û hinek welatên Asyayê bixetere dibîne û balê dikişîne ser êrîşên mafyayê yên li dijî rojnamegeran.

Navenda Nûçeyan

## Dewletê 21 girtî surgun kirin

Li Girtîgeha Êlihê (Batmanê) girtî li didarên girtîgehê greva birçîbûnê didominin. Piştî destpêkirina grevê, 20 girtî grev dagerandin "rojîya mirinê". Li ser veyekê, rayedarên girtîgehê 21 girtî surgunê Girtîgeha Dîlûkê (Entebê) kirin. Ji wan girtîyan 12 kes di rojîya mirinê de ne.


Malbatên girtiyên Girtîgeha Êlihê daxuyandin

ku di 6'ê gulanê de, bi hinceta lêgerînê leşker û gardiyanan êrîşî girtîyan kirine û gelek girtî di êrîşê de birîndar bûne. Piştî êrîşê 21 girtî surgunê Girtîgeha Dîlûkê kirine. Li ser navê girtiyên siyasî yên Girtîgeha Êlihê Tahir Daz û Resul Çeker jî daxuyaniyê nivîskî weşandin. Di daxuyaniyê de tê gotin ku surguna hevalên wan, tewra rayedarên baş nîşan dide û ew heta mafên xwe yên

mirovî nestînin dev ji grev û 'rojîya mirinê' bernadin.

Girtiyên ku surgunê Girtîgeha Dîlûkê bûne ev in: M. E. Edemen, Z. Oruç, F. Baran, H. Dal, R. Kılıç, N. Tunal, Z. Bilen, N. Çatal, F. Calp, D. Öztürk, S. Kılıç, H. Adılg, A. Ertekin, M. Rüzgar, B. Ereng, H. Kalkan, V. Kaya, B. Acar, M. Sevinç, N. Kanat, A. Çiftçi û M. Şahin.

Navenda Nûçeyan



## XAÇEPIRSA BIXELAT (26)

Pendî	Hidrojen	Ufq	Gihanekek	Şanoya bî muzîk	7	Dîllî
Çeqilmast	Bîcêsaret	Artist, jon	Rêxistîneke dînlî ya tirk	Şerîda qelb		2
		Serhildêr		Bîwêjêke eskîrmê		
		Sûret				
Şairekî Soran (wêne)			8			
Dipege				Bakalorya	Navekî Agiriyê	
					21'ê Adarê	
Notayek		Eko, eks		5	Agir	
Tesîr		Vexwarînek			Qey	
1				Cînavkek		Lehengê tiyatroyê, jî Şekspîr
				Şerm		
		Heywan				Da, dayê
		Rengêk				
		Ecêb, sosret		3	Îlahiyek Yewnanî	
		Notayek			Ben	
				Navê herêmeke li bakur		6
		Yezdanekî Misrî		Navçeyêke Sêwazê		4



PEYVA VEŞARÎ

1 2 3 4 5 6 7 8

Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihîjin me, em dinirxînin. Xelat bi riya pişkê li pênc kesan tèn belavkirin. Xelata hejmara 26'an; pirtûka "Qaqlîbaz" e. Ev pirtûk jî aliyê Osman Özçelik ve hatiye wergerandin û Weşanxaneya Firatê çap kiriye.

**Jêrenot:**  
Ji bo ku bersiva we bê nixandî, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.

**Xelata Xaçepirsê**

Richard Bach

**QAQLÎBAZ**

Wergêr: Osman Özçelik

**"Qaqlîbaz"**  
Wergêr:  
Osman Özçelik

Piştî hilweşîna sîstema sovyetîk, Çîn ji aliyê hin kesan ve wekî modeleke sosyalîzmê hate binavkirin. Bi awayekî di ser re dema lê tê nihêrtin, avahiyên nû, dewlemendên nûhatî, bilindbûna rêjeya hilberiyê çavên hin mirovan digirin û ew kes pesnê modela Çînê didin. Li gorî van kesan ji aliyê nîşaneyên ekonomîk ve tu problemên Çînê nîn in, bes di warê demokrasiyê de hin kêmasî hene. Ew problem jî bi defdayîna dewletên mezîn wê çareser bibin.

## Çîn: Sosyalîzma bazara serbest

Dema mirov hinekî bala xwe dide rewşa vî welatî tiştê pêşî bala mirov dikişîne ev e; hemû tişt li Çînê bi sermayedarên biyan ve girêdayî ne, heke ew nebin, wê gelek çalakiyên ekonomîk bisekinin, ji ber vê yekê rayedarên Çînê ji bo sermayedarên biyan bikişînin çî ji destê wan tê, dikin. Li gorî hinek çavkaniyan jî sedî 40 pereyê ku sermayedarên biyan li welatên

lipaşmayî bi kar tînin, li Çînê hatiye razandin. Êdî monopolên mezîn sermiyanê xwe li welatê xwe bi kar naynin, dibin welatên wekî Çînê. Sedema vê yekê jî wekî erzanbûna ked, bêrexiyên karkeran, qanûnên ku rê li ber wan vedikin, erzanbûna berên xam ango hêsanbûna kedxwariyê.

Karsazên biyan, tevî şîrkên xwe yên Çînî karkeran di mercên xerab de

dixebitînin. Li gorî agahiyên lêkolînekê jî sedî 61'ê karkerên ku di kargehên biyanan de dixebitin bêyî dayîna destmizeke zêde, di hefteyekê de 6 rojan tînin karkeran dane zanîn ku tu bergirî ji bo parastina wan nehatine girtin. Bi tenê 5 milyon karkerên ku di kargehên biyanan de dixebitin endamê sendikayan in. Binpêkirina mafên karkeran jî sedî 90'ê

van kargehan pêk tê. Mercên xerabê jiyana karkeran tehdît dike, li gorî lêkolînekê di 1992'yan de li Çînê 15 hezar karker jî ber van şertên xerab mirine. Ev hejmar di nava 10 mehên 1993'yan dibe 60 hezar. Ji ber îhmalkariya xwediyê kar qezeyên li serkar zêde dibin. Wekî mînak di qezeya kanên komirê ya rêbendana 1994'an de tenê di nava hefteyekê de 175 karkerî can da. Ev rastî rengê sosyalîzma Çînê didin der.

SAMÎ BERBANG

### DIK

## Neteweyên Yekbûyî li ber topavêtinê ye

Li gorî nûçeyêke Lajansa Reutersê, Rêxistina Neteweyên Yekbûyî (NY) li ber topavêtinê ye. Hate gotin ku Serokê NY Butros Galî li Press Cluba li Canberrayê civînek li dar xistiye û daye zanîn ku rewşa aborî ya rêxistinê ne baş e.

Butros Galî dide zanîn ku endamên rêxistinê heqê endamtiyê nedane, ji ber vê yekê NY ketiye tengasiyê. Galî got: "Diviyabû 185 endamên rêxistinê di meha rêbendanê de mehaneya xwe bidana, lê bi tenê ji sedî 20-30'yê wan ev pere dan. Min li deriyê hemû endaman xist û alîkariya wan xwest, lê ez bi serneketim." Serokê NY'ê dibêje ku ew nikarin di nava nebûna îmkânên madî de xebatên xwe bidomînin.

Li Sydneyê berdevkeki rêxistinê da zanîn ku pereyên wan di bankayan de nemane. Wî got ku gelek deynê wan heye. Çavdêrên siyasî dibêjin ku ew rewşa rêxistinê, prestîja wê kêm dike û wê dixebin bandora dewletên dewlemend. Ji ber vê yekê dewletên wekî DYA bi serê xwe hereket dikin.

Nûçeyên Derve

Piştî deh salên din artêşa Arjantînê li xwe mikur hat:

# Me mirov ji balefiran diavêtin behrê

Li Arjantînê piştî Fermandarê Giştî yê Artêşa Arjantînê, roja 4'ê gulanê fermandarên hêzên hewayî û behrê, bi awayekî fermî daxuyandin ku wan di dema rêveberiya leşkeriyê de, li dijî hêzên çepgir azîneyên qirêjî meşandine. Daxuyaniya General Martin Balza ya roja 26'ê avrêlê, tevî ku tu agahiyên nû nedidan bû sedema gengeşiyên Balza di daxuyaniya xwe de gotibû: "Divê em tu caran kirêtiyên ku çêbûne înkâr nekin. Ez tenê karim soz û peymanê bidim ku wê careke din tiştên wiha neqewimin." Fermandarê Hêzên Hewayî Juar Paulik û Fermandarê Hêzên Behrê Amîral Enrique Molino Pico jî gotinên nêzî yên qumandarê xwe gotin, lê têkoşîna gerîla wekî hincet nîşan dan.

Li gorî agahiyên resmî di navbera salên 1976-1983'yan de ku

rêveberên leşkerî li ser kar bûne, 4 hezar kes hatine kuştin û deh hezar kes jî winda bûne. Niha rayedarên artêşê qebûl dikin ku wan gelek mirov ji balefirê avêtine nava deryayê. Rêxistinên mafên mirovan didin zanîn ku di wê demê de nêzî 30 hezar mirovî hatine windakirin.

Îtrafkariya leşkeran bi Adolfo Francisco Scilingo dest pê kiribû. Wî di meha adarê de gotibû ku wan li Dibistana Bahariyeyan ya Mekanîkê ya Buenos Airesê (ESMA) 30 kes ji balefirê avêtine nava deryayê. Li gorî agahiyên ku Scilingo dan di nava artêşê de bûyerên bi vî rengî gelek qewimîbûn. Wî digot: "Haya her kesî jî wan kirin heye, lê kes li ser napeyive." Serok û rêveberên cuntayê bi qanûnên taybet hatine parastin. Ji ber ku rêveberên sîvîl naxwazin têkiliyên xwe bi artêşê re



Li Arjantînê di navbera salên 1976-1983'yan de ku rêveberên leşkerî li ser kar bûne 4 hezar kes hatine kuştin û deh hezar kes jî winda bûne.

xera bikin, li hemberî wan daxuyaniyan zehf eleqeyê nîşan nadin. Lê mikura rayedarên leşkerî û rastiyên ku derketin holê, tê gotin ku berî hilbijartina serokatiyê ya 14'ê gulanê rojê Arjantînê guhertiye.

Ew helwesta rayedarên reaksiyona der-

doran, mirovhez dikişîne. Rêxistinên mafên mirovan bi taybetî jî Dayikên Plaza de Maya piştî daxuyaniya fermandarê giştî, li ber qonaxa hikûmetê protestoyek li dar xistin û darizandina kesên ku sûc kirine xwestin. Seroka Dayikên Plaza de Maya Hebe de

Bonafini, Fermandarê Hêzên Hewayê Enrique Şiband rêberî cuntayê Amîral Emilio Massera. Enrique jî tevî Massara hatibû cezakirin, di sala 1990'î de ji aliyê Serok Carlos Menem ve tev hatibûn efûkirin.

Nûçeyên Derve

Di hilbijartina serokkomariyê de Jacques Chirac bi ser ket

## Li Fransayê bayê Muhfezekaran

### JACQUES CHIRAC KÎ YE?

Di sala 1932'an de ji maleke "aristokrat" li nêzî Parîsê çêbûye. Di sala 1967'an de bû mebûs. Di 34 saliya xwe de bû Wezîrê Çandê yê Fransayê (zireetê), di 41 saliya xwe de (1973) bû Serokwezîrê Fransayê û di 1977'an de jî bû Serokê Belediyeya Parîsê. Di salên 1981-1986'an de jî ketibû hilbijartinên serokkomariyê, lê qezencê nekiribû.

Li Fransayê di hilbijartina serokkomariyê de Jacques Chirac bi ser ket. Di hilbijartinê de ku di 7'ê gulanê, roja yeksemê de çêbû, Chirac ji dengan %52.4 stand. Berendamê Sosyalîst Lionel Jospin jî li dû wî bi rêjeya %47.36 deng wergirt. Hilbijartinên Fransayê, ji ber ku li gorî sîstema du etab çêdibin, di encama hil-

bijartina etaba yekemîn de du kesên ku herî pir deng standibin, heqê etaba duyemîn jî qezenc dikin. Wekî tê zanîn di etaba yekemîn de berendamê Sosyalîst Lionel Jospin bûbû yekemîn û Jacques Chirac jî bûbû duyemîn.

Jacques Chirac, 62 salî ye û 18 sal e ku Serokê Belediyeya Parîsê ye. Merasîma serokkomariyê ya dewir-tes-



Jacques Chirac û François Mitterrand

lîmê, wê di 20'ê gulanê de li Qesra Elyseeyê çêbibe. Serokkomarê berê yê Fransayê François Mitterrand, ev serê 14 salan e ku wê

wêzîfeyê dike, wê hem cihê xwe bide Chirac û hem jî îktidara sosyalîstan dewrî muhafazekaran bike.

Nûçeyên Derve

# FAL



**BERAN (21 Adar - 20 Avrêl)**

Dema hûn bi hêrs dibin çavên we tiştêkî nabînin. Ew hêrsa we dibe ku we bixe nava belayên mezin, xwe ji belayê biparêzin hinekî bêhnfireh bin. Cotê xwe hûr bajon, kûr bajon, xeta xwe dûr bajon.



**GA (21 Avrêl - 21 Gulan)**

Hûn li dardora xwe wekî mirovekî/e serhişk tèn nasîn, dema we riyek da ber xwe, serê we biçê ji hûn ji ya xwe danakevin. Ew tişt xezeba hevalan li hemberî we zêde dike. Hay ji xwe hebin, lê we carek daye nava avê, ha li çokê, ha li navê.



**CÊWÎ (22 Gulan - 21 Pûşper)**

Kesayetiya we bidualî ye, hûn zû diguherin. Ew rewş hevalên we şaşwaz dihêle. Di xweparastinê de hûn dibêjin: "Ma ji alemê re edet e, qey ji me re tomet e." Ew bawerî we serê we bitewîne, li gorî wê hereket bikin.



**KEVJAL (22 Pûşper - 23 Tirmeh)**

Hûn dixwazin xwe li her derê nîşan bidin. Heke li derekê civînek hebe, hûn nedawetkîrî bin jî, hûn diçin bejn û bala xwe dinimînin. Kevir li çihê xwe giran e. Pir wêneyên xwe nedin kişandin. Her wênekeş, ne wênekêş e.



**ŞÊR (24 Tirmeh - 23 Gelawêj)**

Tê dtin ku qet debara we li cihên tarî û teng nayê, hûn ji wan deran nefretê dikin. Beredayî negotîne, "Çêlekeke rêxotî garanê dilewitîne." Divê hûn xwe hînî tengasiyê bikin, ji bo wê yekê hûn karin ji hevalekî alîkariyê bixwazin.



**SIMBIL (24 Gelawêj - 23 Rezber)**

Tim mejiyê we bi probleman dagirtiye, qedra van rojan bizanibin, ev roj bi dest nakevin. Karê xwe nespêrin tu kesî, ya ku destê mirov dikin, dê û bavê mirov nakin. Çavên hin kesan li ser we ye, bila haya we jê hebe.



**MÊZIN (24 Rezber - 23 Kewçêr)**

Hûn mirovên kobar in û qet ji tiştên qebe hez nakin. Divê hûn bizanibin ku çiyayê bilind bêmij, geliyê kûr bêav nabin, lewma xwe ji xêrnexwazan biparêzin. Li ser stranbêjiyê bixebitin, dengê we pir xweş e.



**DÛPIŞK (24 Kewçêr - 22 Sermawez)**

Neheqiyên ku li we hatine kirin, hûn tu caran ji bîr nakin û tim li hêviya roja tolhildanê sekinîne, lê xwîn bi xwînê nayê şûştin, xwîn bi avê tê şûştin. Hinekî dilovan bin, gira xwe li hemberî dijmanan nîşan bidin, ne li hemberî mirovên xwe.



**KEVAN (23 Sermawez - 21 Berfanbar)**

Rast e, di dilê we de xerabî tune, hevalên we bi vê yekê dizanin, loma pîrî caran henekên we yên nelicîh jî efû dikin, hay ji gotinên xwe hebin. Ji xwe re pirtûkan bikirin, bibin mirovên zana, ji ber ku xwendin û zanîn nayên talankirin.



**KARIK (22 Berfanbar - 20 Rêbendan)**

Muhefezekariya we, hin caran we ji rastiyan jiyane dûr dixê. Hûn qet guh nadin dera hûn ku lê dijîn. Hatiye gotin ku mirov here kîjan welatî divê here ser edetên wê derê. Ev gotin ji sedî sed nerast be jî, gelo piçek rastî tê de tune ye?



**DEWLİK (21 Rêbendan - 11 Reşemî)**

Hûn di rastiya xwe de mirovên mulahîm in, lê ji bo ku mirovên kevinperest metel bihêlin, hûn xwe wekî mirovên demê nîşan didin. Wekî ku gotina kêfa gavanan siwarbûna keran e, hûn ji şaşwazbûna wan zewqê distînin.



**MASÎ (20 Reşemî - 20 Adar)**

Ji ber ku rewşa we ya aborî baş e hûn qet ehemiyetê nadin pereyan. Gotina, "Heya hûn dojhê nebînin, bihuşt bi we xweş nayê" binin bîra xwe. Hinekî çikûs bin û pereyên xwe li tiştên baş xerc bikin, li dahatûyê bifikirin. Xwe ji xinizan biparêzin.

## Apê Kazim û Mihemed Öcalan

Girtîgeha Amedê, di jiyana miletê kurd de pir girîng e. Ji ber ku ew girtîgeha bêbest û têgermar bi hezaran xort û mirovên kurd, di hundirê xwe de dîtine û kuştine, ji ber wê yekê jî gelek gotin û mesele li ser vê girtîgehê hatine nivîsandin û gelek jê bûne mînak di dîroka kurdan de. Ev mesela ji bo xwendevanên Welatê Me ku ez binim ziman jî, pêkenokeke ku di hundirê vê girtîgehê de qewimîye.

Wextekî Mihemed Öcalan, birayê Serokê Giştî yê Partiya Karkerên Kurdistanê jî wekî her welatparêzên kurd, tê girtin. Di girtîgeha Amedê de her roj bi sedan mirovên welatparêz ji gund û bajarên Kurdistanê, têne girtin. Mihemed Öcalan jî gava welatparêzekî nû tê qawîşa wan, ji wan, wiha dipirse: "Ma hûn ji bona çî hatin girtin?" Di nava wan mirovan de

kalekî ku emrê wî nêzî heftê salî bi navê Kazim jî dikeve qawîşa Mihemed Öcalan. Mihemedê bira, wekî her caran ji Apê Kazim re jî dibêje: "Ma apo gunehê te çî bûn, tu jî girtine?" Apê Kazim, ji Mihemed Öcalan re dibêje: "Ma bavê min, gunehê min çî bû? Ez ne dizim, ne harim û ne dînim. Ez jî wekî her kesî jî ber birayê te hatim girtin, bavê min!..."

SEMYAN CIZÎRÎ

## Ez zanim ne in e lê qewet nîn e!



Dema ku cotkaran bi gacot dikirin, roja inê cotê xwe betal dikirin. Gayê wan jî rehet dibûn. Û tim li benda wê rojê bûn. Rojêke pêncsemê cotkarek dihere cot. Gayê wî jî ji ber ku roja kar a dawiyê ye, çavê wî li benda betalbûna cot e. Pir betiliye û tim disekine; li paş xwe dinihêre. Carekê, duduyan xwediyê wî dinihêre ku gayê wî zexeliyê dike. Çoyê xwe lê dixê û bi zor diajo. Lê belê gayê wî dîsa naçe. Cotkar difikire dibêje: "Gayê min dibêje qey in e loma kar pê zor tê." Gayê xwe dide sekinandin û jê re dibêje: "Ho sêvo, ne in e, ne in e!" Ga jî lê dizivire û jê re dibêje: "Êrê ez zanim ne in e, lê qewet nîn e, qewet!"

ÇIYA MAZÎ

### Tirk lawê tirk!

Li ser tirkan gelek tişt tèn gotin. Li ser vê mijarê, di mijûlbûneke di nav me de, hevalekî serboriyeke xwe ji me re got: - Di erebeyekê de karrekî tirk (ku bi xwe li Îngîlistanê dixebitî) hat li nik min rûnişt. Bi min re li ser rewşa xwe ya li wî welatê biyan dixavî. Gelek gazin li ser nêrîna Îngîlîzan a li ser tirkan dikirin. Wî hevalî mînak jî da min: - Rojêke min dît ku hemwelatiyekî me yî tirk û mirovekî Îngîlîz şer dikin. Tirkê me gelek xeber û gotinên nexweş (wekî ker lawê ker û hwd.) jê re digotin. Îngîlîz bes guhdarî kir. Sekinî, sekinî heta ku tirkê me dengê xwe birî, mirovê Îngîlîz got: "Tirk lawê tirk!" û meşiya.

BEDRAN BÊNAV

### Ez ereb im!

Di navbera Midyad û Mêrdînê de leşker kontrola rê dikin. Erebeyekê didin sekinandin û ji rêwiyan re dibêjin: "Dakevin jêr." Rêwî tev peya dibin, mirovek tenê peya nabe. Serleşker dibêje: - Tu çima danakevî? Mirovê rêwî dibêje: - Ez ne kurd im, ez ereb im. Ji ber vê ez peya nabim. Li ser vê bersivê serleşker hêrs dibe û bi ser de diqêre: - De peya bibe, ker lawê kerê. Me çî kurd saffî kirin îcar dora ereban e?

BEDRAN BÊNAV

### Pênûs mênûs

Rojekê xwendevanek li bajarekî biyan dibistanê dixwîne. Pereyên wî namînin. Nameyekê ji bavê xwe re dişîne, dibêje: "Bavo pereyên min nemane û milyonekî ji min re bişîne, ezê pênûs- menûs, defter-mefer, pirtûk-mirtûkan û sol û molan ji xwe re bikiirim." Dema nameya wî dikeve destê bavê wî, bavê wî radi-be pêncsed hezarî jê re bi rê dîke û nameyekê jî jê re dişîne, dibêje: "Lawê min va ye min pencsed hezar ji te re şand, lê belê divê tu pênûsê bikirî mênûsê nekirî, defterê bikirî mefterê nekirî, pirtûkê bikirî mirtûkê nekirî, solê (pelav) bikirî molê nekirî û li xwe miqate bî kurê min."

ÇIYA MAZÎ

# Mesajên ji bo Cejna Qurbanê

**Ji** bo Cejna Qurbanê, sazî û rêxistinên kurdan, mesaj û beyanatên pîrozbahiyê weşandin. Em, van mesajên ku ketine destên me diweşînin.

## ENIYA RIZGARIYA NETEWÛYA KURDISTANÊ (ERNK):

"Bi hêviya cejnên bêşer..."

Berpirsiyarê Eniya Rizgariya Neteweyî ya Kurdistanê (ERNK) yê Ewrûpa Alî Garzan, bi munasebeta Cejna Qurbanê, mesajek weşand. Garzan di beyanata xwe de Cejna Qurbanê ya gelê kurd pîroz kir û bi wesîleya vê cejnê mesajek wiha da: "Di Cejna Qurbanê ya gelêrî de gel, ji bo bawerî, daxwazî û li gorî tiştên di dilê xwe de qurbanan didin. Em bawer dikin ku gel ji bo edaletê, rastiyê, biratî û xweşiyê vê cejnê pîroz dikin. Di vê meseleyê de em jî wekî wan hîs dikin. Hin misilman hene ku li Bosna û Çeçenîstanê xwedî derdikevin, lê ew çavê xwe ji naxwazin qetlîam û ji holê rakirina kurdan rê digirin, ev jî tewreke dijberî hev.

Bi hêviya cejnên bêşer û li welatekî azad, bichûbûna hukmê edalet, rastî û musamaha ol û mezheban, em cejna Qurbanê ya gelê xwe pîroz dikin."

## HEREKETA ÎSLAMÊ YA KURDISTANÊ:

"Xwedê bi mezluman re be"

Hereketa Îslamî ya Kurdistanê, bi munasebeta Cejna Qurbanê belavokek weşand û cejna hemû misilmanan pîroz kir. Di belavokê de hate gotin ku pêwîst e di rojên wiha de, ji dêla şer û qirkirinan, aşî; ji dêla zilm û neheqîyan, edalet; ji dêla kîl û nefretê, musamaha û biratî; ji dêla çîle û ezabê jî kêf û bextewarî hebe. Belavok bi kurtî vê dibêje: "Di rojên pîroz yên wiha de ev kesên ku ji bo îslaha dinyayê û mirovahiyê şehîd bûne û gihîştine rehmeta xwedê wê bi rahmet, zalim û despot jî wê bi lanetan bîn bibîranîn. Li Rojhilata Navîn 40 milyon kurd, yanî ew gelê ku ummeta îslamê ji du badîreyan xelas kiriye, ew welatê pêxemberan, ji her cure (şikl) mafên neteweyî (mîlî) û însanî bêpar dijîn. Lê êdî em bawer dikin ku gelê Kurdistanê, ew jiyana kevn a ku di bin nîrên koletiyê de derbas dibû, hew qebûl dikin û em dikarin bibêjin ku mizgîniya xelasiyê nêzîk e. Em cejna wê pîroz dikin û temenî dikin ku rehmeta xwedê li maziûman be, lanet jî li zaliman be."

## YEKÎTIYA ALEWIYÊN KURDISTANÊ:

"Welatê me bûye mîna Kerbelayê"

Yekîtiya Alewiyan Kurdistanê jî bi munasebeta pîrozkirina cejna Qurbanê, beyanetek weşand. Li gorî beyanê, Komara Tirkiyeyê Kurdistan kiriyê wek Kerbelayê, rê li ber kesên ku demokrasî, azadî û wekheviyê dixwazin, girtiye. Beyanê wiha dewam dike: "Welatê me bûye wek Kerbelayê, 1800 gund hatine şewitandin, 3000 kes di cinayetên ku failên wan meçhûl in de, beyî ferqîya yezîdîbûn, alewîbûn, sunîbûn û asûrîbûnê, hatine kuştin.

Her roj qetlîamên Sêwaz û Gaziyê tîr serê me. Cejn, sîmge û nîşana aşîyê ne. Lê li welatê me şerekî qirêj heye. Em cejna kesên ku daxwaza wan aşî û azadî ye, pîroz dikin.

Wek Yekîtiya Alewiyan Kurdistanê em dibêjin heta cejn di demeke azad de bîn pîrozkin, wê têkoşîna me berdewam be. Soza ku em didin maziûman ev e."

Welatê Me / Kurd-A



# 30 hezar kesî nalet li faşîzmê anîn

**L**i gelek welatê Ewrûpayê salvegera 50. a xelasbûna Şerê Duyemîn ê Cîhanê (8-9'ê gulanê) bi merasîm û meşan hate pîrozkirin. Li Avusturyayê di 8'ê gulanê de zêdeyî 30 hezar kes li Kampa Nazîyan a berê civîyan û mîting çêkirin.

Di meşê de Serokê Parlemantoya Avusturya, Serokwezîrê Avusturya, 17 balyozên welatên cur bi cur rayedar, xwediyê Xelata Aştîyê ya Nobelê nivîskar Simon Wiesenthal, gelek siyasetvan, hunermend û nivîskar çê girtin. Axaftina destpêkê Serokwezîr Franz Vranitzky kir û piştî wî jî Sîmon Wiesenthal axivî.

Xelasbûna Şerê Cîhanê yê Duyemîn li welatên Ewrûpayê bi merasîmên mezin hate pîrozkirin. Ev şer li Ewrûpayê bi du peymanan xelas bûbû. Peymana yekemîn

di navbera Almanya û Îngilîstan, Amerîka, Fransa û dewletên din de roja 8'ê gulana 1945'an hate îmzekirin. Peymana 2. di navbera Yekîtiya Sovyetan û Almanya de roja 9'ê gulana 1945'an hate îmzekirin. Şer li Rojhilata Dûr jî, piştî ku Amerîka bombeya atomê avêt Hîroşîma û Nagazakiyê, di 10'ê gelawêja 1945'an de qediya. Tê zanîn ku di Şerê Cîhanê yê 2. de nêzîkî 50 milyon însan miribûn û bi deh milyonan jî însan seqet û birîndar bûbûn. Di şer de ji aliyê zaiyata însanan ve zaiyata herî mezin bi 20 milyon Yekîtiya Sovyetê dabû.

## Li Moskovê merasîmên pîrozbahiyê

Li paytexta Rûsya li Moskovê di 9'ê gulanê de ji gelek dewletên biyan bi dehan lîder, ji bo pîrozbahiyên beşdarî merasîman bûn. Di nav

van lîderan de Serokê DYA Bill Clinton, Serokê NY Butros Gali, ji Tirkiyeyê Serokwezîr Tansu Çiller û gelek lîderên dinyayê hazir bûn. Pîrozbahî, ji aliyê bi sedhezaran kesî ve hatin temaşekirin.

## Kurd jî beşdarî pîrozbahiyên bûn

Di merasîmê Avusturyayê de bi kincên xwe yên neteweyî û bi alên ERNK'ê gelek jin, zarok û mîrên Kurdistanê jî çihê xwe girtin. Kurdistanîyan dema çeleng danîn sloganên mîna "Doh yahûdî fro kurd" avêtin. Beşdarên meşê jî bi vê sloganê bersiv dane Kurdistanîyan, "Ji kurdan re azadî".

Li Almaniyayê jî Kurdistanî, di pîrozbahiyên qedandina Şerê Duyemîn de beşdarî meşan bûn. Lê di van meşan de polîsên Almaniyayê, ji ber posterên Serokê

PKK'ê Abdullah Öcalan û alên ERNK'ê, êrîşî ser kurdan kirin. Di van êrîşan de gelek Kurdistanî birîndar bûn. Ji hêla din ve di 9'ê gulanê de di pîrozbahiyên ku li paytexta Rûsya li Moskovê çêbûn de jî Kurdistanî hazir bûn. Di wan pîrozbahiyên de kurdan, bi al û pankartên xwe meşek çêkirin û çeleng danîn Meydana Sor. Ev meş, ji aliyê Moskovayîyan ve bi çepikan eleqeyeke mezin dît.

## Ji bo vê rojê banga PKD'ê

Li ser xelasbûna Şerê Cîhanê yê Duyemîn, Parlemantoya Kurdistanê ya li Derveyî Welêt (PKD) jî daxuyaniyek da. Di daxuyaniyê de ev tê gotin: "Di Şerê Cîhanê yê Duyemîn, bi navekî din Şerê Emperyalîstan de bi deh milyonan însan mirin û seqet man. Êş û şopa şerê lihevparîkirinê hê jî didome. Divêt mirovahî vî şerê ku didome, ji bîr neke. Îro Kurdistan, 4 parçe ye û mesûlê vê yekê jî emperyalîst in. Komara tirk, mîfrasa ku ji Osmanîyan standîye îro jî didomîne. Dewleta tirk a faşîst li Kurdistanê heta vê gavê bi dehhezaran mirov kuştine, zêdeyî 2500 gund şewitandîye û nivê gelê kurd ji ber siyaseta barbar, mecbûrî koç û penabertiyê bûye."

Navenda nûçeyan

## PSK: 'KT dixwaze provokasyonan çêbike'

**B**uroya Partiya Sosyalişt a Kurdistan (PSK) ya li derveyî welêt, roja 4'ê gulanê daxuyaniyek ji bo çapemeniyê weşand. Di daxuyaniyê de tê gotin ku MÎT'a tirk ji bo di navbera rêxistinên kurd de provokasyonan çêbike, texlîla rojnemaya "Riya Azadî" bi navê "Roja Azadî" deraniye û li Stenbolê jî navnîşanên cur bi cur re bi rê kirîye. Daxuyaniya PSK'ê wiha ye: "Di rojnemaya texlît "Roja Azadî" de bi giranî çîh dane daxuyaniyê

Sekreterê Giştî yê PSK'ê Kemal Burkay û hin çîhê belavoka kongreya partiya me ya 4. û hwd. Tê zanîn ku Komara Tirkiyeyê vî yekê ne ji nû ve dike. Berê jî li ser navê partî û sazîyan belavokên sexte derdixistin. Îro jî eynî leyistîkê dikin û dixwazin di navbera rêxistinên kurdan de dubendîyan çêbikin. Em dibêjin û diyar dikin ku di navbera partiya me rojnemaya "xwedêgiravî" de tu tîkilî tune ne"

Kurd -A

## Delegasyona Munîhê li Kurdistanê geriya

Heya îro gelek delegasyon ji Almanyayê çûn Kurdistanê. Lê tu heyetan mîna vê heyeta Munîhê deng neda. Hem çapemeniya tirk û hem jî bi taybetî ya alman li ser vê protestoyê û binçavkirinê pir sekinîn.

Vê heyetê di 18'ê avrêlê de ji bo çapemeniyê civînek li dar xist. Gelek endamên çapemeniya alman jî beşdar bûn. Di nava wan de SAT-1, M-1 û televizyona Bayernê, Suddeutsche Zeitung, Landshuter Zeitung, Tages Zeitung, DPA (Ajansa Agahiyê ya Alman) Radyoya Bayernê, BLF û Radyoya Clavin hebûn.

Civîn li navenda DGB'ê (Konfederasyona Sendîkayên Alman) ya Munîhê çêbû. Di vê civînê de kesên mîna Mebûsa PDS'ê Eva Maria Bulling-Schröter, ji Kurdistan Solidartet Komîteyê Claus Schreer, Pedegog Adelheid Grolnik, ji AG-Internasyonlê Johanna Stockner, rojnamevan Beatrice Ossberg, ji Komeleya Bêsinor Klaus Schikora cih girtibûn.

Serê pêşin Claus Schreer peyivî û wilo got: "Armanca me çavdêrkirina rewşa pênaberên ku ji bakurê Kurdistanê koçî Başûr bûbûn û êrişê leşkerên tirk li ser wan bû. Lê me kir nekir leşkerên tirk nehiştin ku em ji sînor derbas bibin. Me serî li Konsolosxaneyê Alman û Wezîrê Karê Derveyî da, tu feyde nekir. Li ser vê rewşê em jî li bakurê Kurdistanê geriyên. Em çûn Ruhayê (Urfayê), Silopiye, Şernexê, Êlihê (Batmanê), Amedê, Farqînê (Silvan). Li van deran leşker û polîsan nehişt ku em bi gel re têkilîyan deynin. Me bi Komeleya Mafên Mirovan, HADEP û gelek sendîkayan re hevdîtin pêk anîn. Lê rewşa rêxistinên demokratîk ne xweş bû. Polîsên tirk nahêlin ku xebatên xwe bikin.

C. Scheer di dawiya axaftina xwe de bangî raya giştî kir û wiha domand: "Divê em bi rastî alîkariya gelê kurd bikin û em ji îşxalkirina başûrê

Kurdistanê re jî ne razî bin. Li hemberî sûcên dîrokî pêwîst e em bédeng nemînin."

Rojnamevan Beatrice Ossberg ji di peyivîna xwe de li ser çapemeniya tirk û agahiyên wan ên şaş û çewt rawestiya. Ossberg bi vî awayî peyivî: "Li gorî medyaya tirk em hemû teroroist û provokator in. Mirov dibêje qey nûçeyên wan tev bi qelemekê hatiye nivîsîn. ATV'ê (televîzyoneke tirk) bi hevalên me re hevpeyvînekê çêkir. Lê wan jî di nûçeyên xwe de tiştên ne rast ragihandin.

Johanna Stockner li ser Özgür Gündem û Özgür Ülkeyê agahî da medyaya alman û pişt re gotinên xwe wiha domand: "Em li çapemeniya tirk û ya dunyayê dinîhêrin ku tu rojname wekî wan berdêl nedaye. Ji bîstî zêdetir endamên wan hatine kuştin, bi sedan hatine girtin. Di dawiyê de Özgür Gündem hate qedexekirin û sê buroyên Özgür Ülkeyê hatin bombekirin. Wexta em li Kurdistanê bûn rojnameyêke din dest bi weşanê kir. Lê endamên wê jî hatin binçavkirin û her hejmarên wê hatin sansurkirin.

Di vê civînê de parlementera PDS'ê Eva Maria Bulling-Schröter bi axaftina xwe bal kişand ser rewşa gundiyan Şkêftan (Suçeken) û daxwaznameyên wan ên ku ji rêxistinê navneteweyî re hatibûn nivîsandin, belav kirin.

Ji Komeleya Bêsinoran Klaus Schikora jî tiştê ku li Farqînê hatibû serê wan û rewşa ku li gundê Hislamergê di cih de dîtibûn vegote beşdarî.

Di dawiya civînê de ji bo hevpeyvîne me tekîfêk li wan kir. Tekîfa me bi van gotinan qebûl kirin: "Ji bo ku em kanibin agahiyê bidine gelê kurd, ev îmkaneke mezin e. Em xwe ji gelê kurd re deyndar dihesibînin. Pişt re em çûn cem wan. Me dît ku gelek karên wan heyê û ji çapemenî û TV'yan zehf kes hatine ku ji bo hevpeyvîne randevûyê ji wan distînin. Di vê rewşê de me ev hevpeyvîn pêk anî û em pêşkêşî we dikin.



Li gorî endamên Komîteya Kurdistan Solidaritet û Sen-polîsên tirk ew bi van gotinan tehdît kirine:

# 'Hûn careke din emê we bikujin'

**G**elo li Farqînê çi qewimî?

- Roja îne, piştî nîvro em gihan Amedê. Berê êvarê agahiyek gihandin me ku leşkerên tirk li gundê Farqînê, Hislamergê operasyoneke mezin çêkirine û gelek gundî xistine binçav. Me wê rojê nikaribû biçin û mexwe bigihanda gundiyan. Roja şemiyê, sibehê zû em ketin rê. Di rê de, li gelek cihan leşkeran em sekinandin, li nasnameyê me nihartin. Ji bo ku parlementerek bi me re bû, rê dan me. Dema em gihîştin gund, me dît ku jinike-

ke birîndar li traktorê siwar kirine dibin nexweşxaneyê. Gundiyan em dîtin û bi tilîliyan ber bi me ve hatin. Zarokan bi tiliyên xwe îşaretê serkeftinê nişanî me didan. Xaniyek bi destê leşkeran hatibû şewitandin. Gundiyan (ku gişt zarok û jin bûn; ji bilî çend kalemeran) ji me re gotin: "Xwezî hûn doh bihatibûna, we rewşa me bidîta û dengê me li dinyayê belav bikira." Lê me fêhm dikir ku çi hatiye serê wan. Ji me re gotin ku leşkerên tirk bi panzer, helikopter û 20 cemse-

yan girtine ser wan, di binê baranê de heta êvarê îşkence û tahde li wan kirine. 2 jin û 4 mêrtazî kirine û li wan îşkence kirine. Ço kirine devê mêran, heta gewriya wan daf dane. Zarok û jin li dibistanê civandine û ew bi kuştinê tehdît kirine. Solên naylon kirine nava mazotê pişt re agir berdane wan û bi ser mêran de dilo-pandine. Mizgefta wan tevî hev kirine, zêr û pereyan wan dizîne. 80 kes jî bi xwe re birine. Di nava wan de 10-15 zarok jî hebûne. Me dixwest em hebekî din jî li



**Endamên delegasyonê di civîna çapemeniyê de têne dîtin. Li ser pankartê, "Êdî bes e, taqîba kurdên ku li Almanyayê ne."**

Claus Schreer  
**Werin**

"Gundiyan Hislemêrgê bila werin berdan" nivîsand. Û dîsa bi almanî, tirkî û kurdî "Freiheit-Özgürlük-Azadî" nivîsand. Roja yekşemê em 11 heval çûn Farqînê û bi pankartan em meşîyan.

**Li hemberî meşê, tewra polîsan û ya gelê kurd çawan bû?**

- Gelê kurd pir kêfxweş bû, lê polîs heyrîn, nizanibûn çî bikirana. Ji dûr ve em dişopandin. Dixwestin nivîsên li ser pankartan qeyd bikin. Nêzîkî 20 deqeyî em wisa meşîyan. Ha me dît, ji nişka ve êrîşî ser me kirin. Pankartên me çirandin û em bi xwe re birin qereqolê.

**Çapemeniya tirk ra-gihand ku du hevalên we reviyane. Rast e?**

-Ew du heval bi me re ji bo protestoyê hatin Farqînê. Lê ew tirsîyan, bêrî ku protesto dest pê bike ew fetilîn Amedê. Wexta em birin Amedê qereqolê me dît ku ew hevalên me jî anîne wirê.

**Polîs ketin hundirê nezaret-xaneyê û li ber derî du jin hebûn, li wan xistin. Hem li wan dixistin û hem jî digotin ku li gorî qanûnê divê ku me bibin ser doktor. Li ser vê yekê em razî bûn û em çûn doktor. Hevalên me jî doktor re gotin ku polîsan li wan daye. Careke din em anîn qereqolê û bi vîdeoyê filmê me kişandin. Me jî rûye xwe dinixumand, da ku nîkaribin bi hêsanî me bikişînin vîdeoyê. Wê çaxê polîsan biqîrîni digotin me "xwezî me hûn neanîna qereqolê hîzbûlahiyan hûn bikuştana."**

**Hûn biribûn qereqola Farqînê?...**

- Belê li qereqola Farqînê nêzîkî dî saetan em dan sekinandin. Tişteke nivîsîn û ji me xwestin ku em îmze bikin. Lê me ew îmze nekîr. Paşê em bi minîbûsa polîsan

birin Amedê. Li vir polîsan tim jî me re didan çêr û dijûnan.

Lê çapemeniya alman daxuyand ku li virê polîsan li du hevalên we dane...

- Gava em li Amedê li Şaxa Têkoşîna bi Terrorê re bûn, polîsan xwestin ku em di gel wan herine doktor. Me qebûl nekîr. Me got ku emê bi Konsolosxaneyê Alman re bi telefonê bi-axivin. Li ser vê yekê polîs ketin hindurê nezaretxaneyê û li ber derî du jin hebûn, li wan xistin. Hem li wan dixistin û hem jî digotin ku li gorî qanûnê divê ku me bibin ser doktor. Li ser vê yekê em razî bûn û em çûn doktor. Hevalên me jî doktor re gotin ku polîsan li wan daye. Careke din em anîn qereqolê û bi vîdeoyê filmê me kişandin. Me jî rûye xwe dinixumand, da ku nîkaribin bi hêsanî me bikişînin vîdeoyê. Wê çaxê polîsan biqîrîni digotin me "xwezî me hûn neanîna qereqolê hîzbûlahiyan hûn bikuştana."

**Hûn derxistin dadgehê?**

- Roja duşemê em derxistin Dadgeha Ewlekariya Dewletê. Dema em birin dadgehê me li hewşê, Parlementera Partiya Keskan Anke Dieter-Scheuert dît û me gazî wê kir. Ew jî bi me re kete salona dadgehê. Em birin hemberî

serdozger. Ji me re wiha got: "Heke ez bixwazim, ez dikarim we 30 rojan di binçav de bihêlim. Ez dizanim ku Delegasyona Munîhê li wir di nava Komîteya Kurdistanê de dixebite." Pişt re em birin ba dozger, wî jî gote me, "Hûn careke din tişteki wiha bikin ezê we bi-avêjim girtgehê." Polîsan heman bi erebeyan em birin otelê gotin "zû xwe amade bikin, emê we bişînin." Me dest bi amadekirina xwe kir, di wê navê de polîs ketin odeya me û gotin: "Ku hûn careke din werin emê we bikujin."

Em anîn balefirgehê. Sê saetan em li hêviya balefirê dan sekinandin û nehiştin ku em herin cihekî.

**Rayedarên dewleta tirk dibêjin ku tu bûyer li gundê Hislemêrgê neqewimiye. Hûn li ser vê daxuyaniye dikarin çî bibêjin?**

- Ne rast dibêjin. Ne-rastî bûye xisleta wan. Me gotinên gundiyan û xaniyê ku şewtandine girtine vîdeoyê. Me ew film bi mebûsa PDS'ê re şandibû Almanyayê. Di rojekî nêzîk de emê vî filmî jî bo raya giştî bi-veşînin. Em dixwazin vî filmê hanê bidine TV'ya MED'ê ku gelê kurd jî karibe lê seyr bike.

**Ji bo xwendevanan jî hûn dixwazin tişteke bibêjin?**

- Erê, rojnameya Hürriyetê dibêje ku me li balefirgehê bertîl (rûşwet) daye xebatkarên balefirê, lê wan qebûl nekiriye. Li ser vê derewê em dixwazin çend tiştan bibêjin. Roja pêncşemê emê vegeyriyana, lê me dixwest em zû vegeyriyana Almanyayê. Me jî THY'ê pirsî gotin ku ji bo roja sêşemê di balefirê de cih nemaye. Gotin me: "Werin li balefirgehê bisekinin, heke cihê vala çêbû wê çaxê em dikarin wê bişînin." Em jî rabûn çûn balefirgehê û em sekinîn.

Di vî navê de gelek rojnamevanan bihîstibûn ku em li balefirgehê ne, hatin bi me re hevpeyvîn çêkirin. Paşê jî me re gotin ku di balefirê de ji me re cih dîtine. Me jî amadehiyên xwe kirin. Hevalekî me li ser vê yekê jî kêfan 20 DM'ê dirêjî xebatkarekî dîke dibêje: "Ji kîsî min qahweyekê vexwe." Ev xebatkar jî vî rewşê hêrs dibe û heqaretan li hevalê me dîke. Ev tişte hanê li Almanyayê ade-tek e. Lê rojnameya Hürriyetê dibêje ku me bertîl li xebatkaran tek-lîf kiriye.

Divê em vî bibêjin. Dema em di binçav de bûn gava hevalên me dixwestin tiştinan ji xwe re bistînin, polîsan zehf pere ji me dixwestin, ji bo ku fihyacê me temîn bikin.

**MAHMUT GERGERLİ**



Endamê Kurdistan-Solidaritet û sendikavan Claus Schreer di civînê de.

Li gorî agahiyên hatine bidestxistin di pêvajoya heftiya dawî de zêdeyî 100 cerdevan û hêzên dewletê di kemînên gerîla de mirin

# Di vegeerê de leşker li kemînên gerîla diqelibin

Nûnerê ERNK'ê yê Ewrûpayê Alî Garzan:

'Livbaziya Küçükçekmeceyê ne karê ERNK'ê ye'

Nûnerê ERNK'ê yê Ewrûpayê Alî Garzan, li ser bûyera Küçükçekmeceya Stenbolê ku di 4'ê gulanê di bûbû û tê de 3 kes miribûn daxuyaniyek da Kurd-A'yê. Garzan di daxuyaniya xwe de dibêje ku livbazî ne ji aliyê endamên partiya wan û ERNK'vanan ve hatiye kirin. Dibeje ku bûyer ji wan dûr e û di bingeha bûyerê de jî tê xuyan ku bi îhtîmaleke mezin, fêneke dewletê heye. Dewlet bi vî yekê xwestiye ku dijminîti bixe navbera gelan.

Di dewama daxuyaniyê de jî hatiye gotin ku çapemeniya cenga taybet bi zanebûn bûyerê berevajî dîke û dadixuyîne ku, di bûyerê de sloganên alîgirê PKK'ê hatine avêtin. Lê, sloganên ku nivîsandine jî ne sloganên wan in. Alî Garzan daxuyaniya xwe bi vî awayî didomîne:

"Çapemeniya tirk wekî şaxekî cenga taybet dixebite û bi taybetî bazirganiya xwînê dîke." Di dawiya daxuyaniyê de jî hatiye diyarkirin ku bûyera "Nazlîm Bûtîk" fênek e û bi vî yekê dixwazin gelê tirk û gelê kurd berdîn hev.

Daxuyaniya li ser bûyera Küçükçekmeceyê bi van gotinan diqede: "Divê kes bi van tehrîk û fênd û futan nexape. Diyar e ku hêja do li taxên Gazî û Umraniyeyê kê qetlîam kiriye. Bi vî yekê dixwazin şovenîzmê û faşîzmê har bikin. Her sê însanên ku di bûyerê de mirine, însanên me ne jî. Em ji malîyên wan re serxweşiyê dixwazin. Bi vî sebebê em carekê din li gelê tirk bang dikin, werin em ji bo demokrasî û azadiyê dest bidin hev."

Navenda Nûçeyan

Buroya Artêşa Rizgariya Gelê Kurdistanê ya Botanê, roja 1'ê gulanê bilançoya meha avrêlê weşand. Li gorî vî daxuyaniyê, di meha avrêlê de li 163 cihan livbaziyên gerîlayên ARGK'ê çêbûne. Di encama van livbaziyan de 899 (10 heb jî birutbe) leşker, 74 cerdevan, 6 kontra, serokê belediyyekê, 11 sîxur û 18 ajan, ji aliyê gerîlayan ve hatine kuştin. Li gorî ku di daxuyaniyê de tê diyarkirin, di vî heyamê de 158 gerîla jî mirine.

02.05.1995

Li navçeya bajarê Êlihê, li Sasonê gundên bi navên Şixika, Pirmis û Helîz ji aliyê hêzên dewletê ve hatin şewitandin.

Di navbera gerîlayên ARGK'ê û hêzên dewletê de li Sêrtê lihevxiyên derket. Der heqê mirî û birîndaran de agahînehatin standin.

Li Dêrsimê, li navçeya Nazimiyeyê hêzên dewletê gundê Hakîs vala kirin. Gundiyên Hakîsê, malên xwe birin navenda navçeya Nazimiyeyê.


03.05.1995

Li Culemêrgê di navbera gundên Vergenama û Nîşanê de gerîlayên ARGK'ê hêzên dewletê xistin kemînê. Di vî kemînê de gerîlayek û 20 leşker mirin.

Gerîlayên ARGK'ê li Botanê êrîş birin ser Tabûra Madenê. Di vî êrîşê de leşkerek mir û nêzîkî 15 leşker jî birîndar bûn.

04.05.1995

Gerîla li Çewlikê (Bîngolê) li navçeya Dara Hênê êrîş birin ser Qereqola Mavan. Di êrîşê de



3 leşker mirin û gelek jê jî birîndar bûn.

Li Dergehê Xabûrê gerîlayên ARGK'ê êrîşî ser hêzên dewletê kirin, der heqê êrîşê de tu saloxî bi dest neketin.

Gerîlayan li Çewlikê, li gundê Sariboş girtin ser malê cerdevanan. Di vî cerdê de gerîla dest danîn ser 400 pezî û 11 cerdevan jî bi xwe re birin.

Komek leşker li gundê Mêrdînê li Girgê ketin kemîna gerîlayên ARGK'ê. Di vî kemînê de 21 leşker mirin û nêzîkî 20 leşker jî birîndar bûn. Di vî bûyerê de gerîlayan dest danîn ser çekek MG-3, çekek M-16, karnasek û 2 çekên çardehxwer.

Gerîlayên ARGK'ê li navenda Kerboranê êrîş birin ser lojmanên polîsan. Li gorî agahiyên gerîlayan, di vî êrîşê de lojmanên polîsan, xesareke mezin dîtine. Der heqê mirî û birîndaran de tu agahî bi dest neketin.

Di navbera Kerboran û gundê li ser Kerboranê Amara de, gerîlayan

traktoreke cerdevanan xistin kemînê. Di kemînê de cerdevanek mir û 2 cerdevan jî birîndar bûn.

05.05.1995

Li navçeya Dêrsimê Pêrtaxê, di navbera gerîlayên ARGK'ê û hêzên dewletê de şerekî pir mezin derket. Şer şevêkê dest pê kir û heya êvarê dom kir. Di vî şerî de 11 gerîla, 2 gundî û 21 leşker mirin.

Di navbera riya Xozatê û Pêrtaxê de gerîlayên ARGK'ê kontrola rê xistin destê xwe. Di vî livbaziyê de gerîlayan dest danîn ser qamyonek ard (arvan). Li ser mudaxeleya hêzên dewletê, şer derket. Di vî şerî de nêzîkî 10 leşker mirin û bi qasî wan jî birîndar bûn.

Li Dêrsimê di warê Kizidaxê de di navbera gerîlayên ARGK'ê û hêzên dewletê de şer qewimî. Şer ji serê beyaniyê û heta êvarê dom kir. Di vî şerî de 7 leşker û gerîlayek mirin.

Gerîlayan li Dêrsimê li warê Beydaxê êrîşek birin ser leşkeran. Der

barê vî êrîşê de agahî nehate standin.

Di navbera Pasûr û Sasonê de gerîlayên ARGK'ê ji sê milan ve hêzên dewletê xistin kemînê. Di vî kemînê de 15 leşker mirin û serleşkerê wan jî winda bû.

Hêzên dewletê gundê Begîjnê ku li ser navçeya Geverê ye, vala kirin. Leşker, ji bilî valakirinê tehde û îşkence bi gundiyan kirin.

Gerîla cerdî ser Tabûra Deştan kir ku nêzîkî bajarê Culamêrgê ye. Di dawiya cerdê de gelek leşker mirin, nêzîkî 30 leşker jî birîndar bûn.

06.05.1995

Li Mêrdînê, di navbera gundên Meterûs û Çewceyê de gerîlayên ARGK'ê wesîteyê cerdevanan şewitand. Piştî vî livbaziyê, cerdevanên gundê Meterûs xwestin mudaxeleya gerîlayan bikin. Li ser vî bûyerê gerîlayan, cerdevan ji sê hêla ve xistine kemînê. Di van kemînan de 4 cerdevan mirin.

Di warê Çiyayê Bagokê de li gundê Karê,

gerîla girtin ser mewziyên cerdevanan. Di vî livbaziyê de 2 cerdevan mirin û cerdevanên din jî birîndar bûn.

Li navçeya Midyadê li gundê Kentoreyê, gerîlayan bi çekên giran ve êrîş dan ser qereqola gund. Di vî cerdê de 2 leşker mirin û nêzîkî 20 leşker jî birîndar bûn.

Li Başûr, di navbera warên Hela û Beşelîkê de gerîlayên ARGK'ê bi hêzên komara tirk re şer kirin. Di vî şerî de 2 leşker mirin, nêzîkî 20 leşkeran jî birîndar bûn.

07.05.1995

Gerîlayên ARGK'ê li Geverê êrîş birin ser Tabûra Vargemîna. Di vî êrîşê de 17 leşker mirin, 8 jî birîndar bûn. Piştî vî qewimînê hêzên dewletê bi panzer û tankan gule li ser gundê Vargemîna reşandin. Di vî bûyerê de 7 gundî birîndar bûn û gelek mal jî, ji aliyê hêzên dewletê ve hatin wehrankirin.

Hêzên dewletê, li dû vegera Başûr li navenda Geverê dest bi operasyonan kirin. Di van operasyonan de 75 kes xistin binçav.

Gerîla li Başûr di warê Enamûnê de êrîşî ser qasî 100 leşker kirin. Li gorî agahiyên gerîlayan, di vî êrîşê de laşê 26 leşkeran ji aliyê wan ve hatine tesbîtkirin. Gerîlayan, di vî şerî de çekeke MG-3, çekeke G-3, Hewaneke 1.60 mm, dekteoreke mayinan, bêtêlek, çekekê lavê, 7 roketên hawanan, 1200 berîkê G-3, 10 narincok (bombeyên destan) bi dest xistin.

08.05.1995

Hêzên dewletê li Geverê, di warê Vargemînayê de pêl mayina gerîlayan kirin. Di vî bûyerê de 5 leşker mirin û 3 jî birîndar bûn.

Li Amedê, di navbera navçeyên Pasûr û Licê de gerîlayên ARGK'ê li du cihan leşker û cerdevan xistin kemînan. Di cara yekemîn de 4 cerdevan mirin, cara duyemîn de jî 2 leşker mirin û nêzîkî 15 leşker û cerdevan jî birîndar bûn.

Navenda Nûçeyan

## Ferqa polîsên tirk û alman ji hev tune

Êrîşên polîsên alman ên li ser saziyên kurdan didome. Roja 5'ê gulanê polîsan bi ser saziyên kurdan Navçeya Kurd, YRWK, Enstîtûya Kurdî, Hunerkom û TAJK'ê ve girt, ku gişt di Mala Kurdan a Berlînê de ne. Polîs di saziyan de lêgerin pêk anîn û dest danîn ser kompîtûr û weşanan. Polîsên alman roja 5'ê gulanê saet nêzîkî 8.00'ê êvarê,

bi hêzêke 150 polîsî ve avête ser Mala Kurdan. Polîs sebebê cerdê wekî lêgerîna kereşeyên (malzemeyên) molotof kokteylî nîşan da û wekî din tu agahî neda. Piştî lêgerînê jî dest danî ser kompîtûr û weşanan saziyan.

Li ser vî yekê, ji endamên Navçeya Kurd Veysel Botanî daxuyaniyek da û got: "Polîs besebeb û an jî bi sebebên tewş

cerdî ser saziyan kurdan dikin. Dixwazin bi vî yekê jî Kurdistanîyan provoke bikin. Ev car jî bi bahaneya lêgerîna malzemeyên molotof kokteylê avêtin ser saziyên me. Lê, li aliyên din dewleta alman çekên kimyewî, panzer û çekên cur bi cur dişîne Kurdistanê û bi wan kurd tîn qirkirin."

Kurd-A

Rexneyek li alfabeya Celadet Bedirxan û lêgerîneke ji bo alfabeyêke nûjen:

# Alfabeya Celadet

## bersivê nade hewcedariyan

Kurdî di domana dî-rokî de bi deh alfabe-yên ji hev cuda hatiye nivîsandin. Mixabin, di tu demê de li gorî dengzanîna kurdî alfabeyêke tîkûz nehatiye çêkirin. Alfabeyên kurdan di bin bandora alfabe-yên cî-ranên wan de mane. Alfabeya mediyana a ku pê tenê nivîsek gihîştîye îro, di bin bandora ûrartûyan de maye. Alfabeya êzidiyan, ku wekî alfabeya kurdî ya neteweyî tê pejirandin, her çiqas bi tîpên xwe ji alfabeya erebî cuda bê xuyakirin jî, di bin bandora vê alfabe-yê de maye. Dengên ku di kurdî û farisî de dengên bingehîn nîn in, lê di alfabe-yê de cih digirin jî bi awayekî eşkere vê bandora erebî didin xuya kirin. Dengên di erebî de tune ne û di kurdî û farisî de hempar in di vê alfabe-yê de cih digirin. Ev jî dide xuyakirin ku di çêkirina vê alfabe-yê de, ji farisî hatiye îstifadekirin. Dibe ku ev alfabe li gorî zaravayê mûkrî hatibe amadekirin. Çar dengên bingehîn ên ku di zaravayên kurmançî û zazakî de cih digirin di vî zaravayî de tune ne. Mirov kare bibêje ku, ji ber vê sedemê van dengên di vê alfabe-yê de cih negirtine. Ji alfabeya neteweyî derbasbûna alfabeya erebî vê dîtîne rast dermaxîne.

### Alfabeyêke li gorî dengên kurdî

Di destpêka pejirandina alfabe-yê erebî de, kurdan tenê tîpek li vê alfabe-yê zêde kirine. Farisan li gorî zimanê xwe çar deng li alfabe-yê erebî zêde kirine. Kurdan heta sedsala bîstana alfabe-yê farisî bi kar anîne. Di van salên dawîn de kurdên soran bi alîkariya alfabe-yê kurdî ya latînî, ji bo dengên "ê, û, o", sê tîp li alfabe-yê farisî zêde kirine. Ji ber ku di vê guherîna de dengên bingehîn ên di zaravayên din de hene, lê di zaravayê soranî û alfabe-yê latînîya Bedirxaniyan de cih nagirin, nehesibandine, ev alfabe jî di sînorên zaravayî de maye. Mirov dikare bi hêsanî bibêje ku ev al-

fabe, ne li gorî dengzanîna kurdî, lê li gorî dengên bingehîn ên zaravayekî kurdî hatiye amadekirin. Ji ber vê sedemê, ev alfabe her çiqas li gorî bikaranîna alfabe-yê farisî tekûztir û gavekî dîrokî be jî xwe ji kêmasiyên ku ji zaravayîbûnê tîne, xwe xelas nekiriye.

### Alfabeya Krîlî

Di nava sê alfabe-yên (erebî, latînî, krîlî) ku îro hîna kurd bi kar tînin de ya li gorî dengzanîna kurdî hatiye çêkirin alfabe-yê kurdî ya krîlî ye. Ji



ber ku ev alfabe jî wekî ya erebî li ber derfetên bikaranîna teknîka pêşveçûyî ya welatên rojavayî asteng e, di nepejirandina wê de piraniya zimanzan û rewşenbîrên me hemfikir in. Jixwe pirs ne tîne teknîkî ye jî. Ji aliyê hêsanîyê ve jî hînbûna xwendin û nivîsandina kurdî ya bi alfabe-yek standard a ji tîpên latînî li gorî yê din hêsan-tir e. Piraniya gelê me ji alfabe-yê latînî re biyan nîn e.

### Em hê di destpêkê de ne

Bi alfabe-yê kurdî ya ji tîpên latînî heta îro çiqas kitêb, rojname û kovar hatibin weşandin jî, em hîna di serî de ne. Hej-mara mirovên ku bi alfabe-yê me îro pê dinivîsin, ji çend sed mirovî derbas nabe. Mirovên bi vê al-

beyê dixwînin jî, ji tîraja rojname û kovarên kurdî baş tê fêmkirin ku nagihê sed hezarî. Ji ber vê yekê em karin guherîna radîkal di demeke kin de bi van xwendevanên ku piraniya wan çend zimanan zanin, bidin pejirandin.

### Tewra

#### Celadet Bedirxan

Celadet Bedirxan hem bi xebatên xwe hem jî bi gotina xwe eşkere dide xuyakirin ku çiqas di bin bandora alfabe-yên neteweyî yê welatên din de

de dimîne û bi gotina xwe "tîpên bi bilindek û jêrindek" ên alfabe-yê fransîzî (ê, î, û, ç) di alfabe-yê xwe de bi cih dike. Di vê demê de, ji ber ku tirkan jî alfabe-yêke bi tîpên latînî pejirandine, li gel tesîra fransîzî di bin bandora tirkî de jî dimîne û 'Ş' ya tirkî wekî ber-hemeke vê bandorê dike-ve alfabe-yê kurdî ya bi tîpên latînî.

### Teorîzekirina xeletiyên

Wekî tê xuyakirin Celadet Bedirxan bi her bayekî re berê xwe bi aliye-kî de kiriye û tu demê bi hişekî azad li ser alfabe-yê kurdî ya bi tîpên latînî nikaribûye bixebite. Ji ber van sedeman alfabe-yê ku bi alîkariya Roger Lescot çêkiriye tu demê nebûye alfabe-yêke tîkûz a kurdî. Belkî li gorî pêşveçûna zimanzanîna wê demê û hema hema nebûna lêgerîn û lêkolînên li ser dengên kurdî, çêkirina alfabe-yêke neteweyî ya kurd a ji tîpên latînî ne mumkun bû. Lê îro kes nikare xwe bispêre îdîa-yeke bi vî awayî. Alfabeyên her zimanekî ji bo gelê bi wî zimanî dîaxivin li gorî teknîka zanîna wî zimanî tîne çêkirin. Di dinê de ji xeynî kurdan tu gel tune ye ku ji bo zimanê xwe hîni gelê xwe bike, alfabe-yê xwe nêzikî alfabe-yê neteweyêke din bike, bi vî jî neseke li ser navê hêsanhînkirinê bi dil û can li teorîzekirina vê bixebite. Celadet Bedirxan ji bo girtina 'Ş' ya tirkî mafdar derxîne wiha dibêje: "Ji bo kurdên Bakur hêsan-tir hîni xwendin û nivîandinê bi-bin min alfabe-yê xwe nêzikî ya tirkî kir." Ev teorîzekirina xeletiyê ye. Lê xeletiya ku li teorîzekirina wê dixebite jî bi kêmasî ye. Baş tê zanîn ku ji aliyê teknîkî ve di navbera bikaranîna tîpa 'Ş' û tîpa 'I' ya tirkî de tu ferq nîn e. Herdu jî tîpên taybetiyên alfabe-yê tirkî in. Celadet Bedirxan ji van yek girtiye, ya din negirtiye.

ROJHAT AZADÎ  
Dûmahîk heye

## DEFTER

### Barût û gûlê an aqlimendî?

47 ser myancê dej û janan di zê hon viyertîbira. Vêrî tîjvê-jayîş di her kesê xwi re lez wirîştibwe. Tikîn çimî xwi guvîznên, tikîn dest eştib fincanê qawî merdom bawer kerdê ku hawar verdê. Zego ku rojî qiyam byero. Nizdî re rojî yoşemî nyemananî xwi rê ber kerdêa. Myantê qirnanî ereban û qeşê aşmê vorvaran di neyaranî nîmesrêk yo heta hêdî hêdî lingênêrû. Honêko xerîb bi zê şew û rojek lez viyertîbra. Honêk bi kî xwi bar kerdib, hotî ko/kwî xwi dima eştib, kotiv dinyêka bîn nîwaştê derd û kulanî dinya vêrin biyaro xwi vîr.

Kuçanî yoşemî bîriyê avdanî xwi kerdê. Hewa re pê rengêko spîkewî di ezmanî guhdarî vengêko newî ku zerê 47 seran di nêyamib eşnawitîş, kerdê. Newî bi çimku nêyamib eşnawitîş. Zarejon, hor û astoran, hewa û awê xwi di waştê in veng biyero yin.

"Riyêko derg, 47 ser: Yo rojî yi bêşer nêvîyertra. Ma şew û roj şer kerd û hemû şeran di zî kotî ser. Ma neyar xwi bi tank û balafirana fetelnê, ma dinya yin çim di kerd tarî. La ma nîşkê çiyoy ku ma waştê, biker xwi dest. Ma nika zaf rind zanî ku destkerdîş in çiyî zehmet o. Aştî..."

Warî in vatôn bibî sor, zerê holêka gird di vêrî masêk di lingan ser vindetîb, waştên awazî xwi bîresno qirnê dinya, 10'î aşmê vorvaran bibî şahidî in vatôn. Waştê zaf çiyân vajo. Bin vatônî xwi şidînen zego ku pê bawer nêyêbo ku her kes guhdarî keno.

Rêrê qeflayî/ westî êsên. 47 seran bêtaqat kerdiv, rê yi di xêr viraştîbî. La bi hêvî bi, dormalê xwi re vêjin girotê. Wexta vengî "pêxember Perez" amênçî wiyayîşêko ci di kotê ser û liviyêk kotê laşê yi. Vatê se? Çi waştê? Gorê tîkî şahî-

dan fêlbaz û dekbaz vî, xapitîş dima bi. Gorê tikiyan zî waştîxwazî aşî bi. Kam çî zano! La wi nêvindetê:

"Dema ku derbas bi bi ma gelêk çî dê zanayîş. Ma dî ku feidê barût û gûlan çî no. Ma rê zanayîş û îrfan lazim o. Wextî aqlimendî û logîk o. Têna aqlimendî û zanayîşiko bi waştîş re eşkenî qê aşî keranî vêrînan rûnî. Ma wazenî Rojhilato Navîn yo bo û helindê tank û panzeran di zanayîş û waştîş qîşêbikêrî..."

"Pêxember Perez" ku pyerdayîş Erab û Yehudiyân di cê ku navçer girotov, "paytextî xelatan" Oslo re 10'î aşmê vorvaran di kiştâ rast di dijmên seran Arafat, kiştâ çep di zî hevalî riya Rabîn dinya rê, vatê corîn eşawitê. Awqeydî vatên ku yo wo ku biwazo hezkeranî tank û balafirana re vajo êdî bes o. Barût dej û poşmani re ber çîk ri nêbeno. Qelebalixî vêrî lingan di heyecanêk viraziyabî. Myanî yin di rezanî vêrînan di xatûn Arafat, Rabîn û Perez ku ewqas can û cendêk vêrî çimam xwi di dibî, rûniştêbî. Alehza hestanî yin çî qeydî eştê, baweriyê yin çî qeydî bî Homa bizano!

Polîtîkvanî seran Perez rastiyê xwi di aşî waştê an kêkerdîş, ayê zî Homa bizano, la in zaf muhîm no. Çî wo muhim in o ku vatônî yi di qê yin ku bi tank û balafirana xwi bi serxoş, gwîn/xwîn gêrawa çimam, rojnaman vêşnêni rê dersî giran estî. Perez waştê vajo ku: Cê xwi di vinderê, ma zafiyê rê kesêk trîlyonî qê şer û kiştîş xerc nêkerdî. Ma nîşkê berisari, şima çî qeydî benî xizanan! Hişê xwi biyari xwi sari, peranî xwi bidê zanayîş ku şima ehmeqî ver helaknêbî. Mileta ku wîrîştâ lingan ser bi firokan wertî re nêdiyênawera.

MEMO DARRÉZ



ÇEND PÊŞNIYAZ JI BO NIFŞÊN KU TORINÊ NAÎRÎ NE

# RIH DIBE BIHOST DIJMIN NABE DOST

**Li vir temaşe bikin nivîskarê "Mezopotamya û li Kurdistanê gereke nependî" Soane (sala 1912'an Londra) çi dibêje: "Kurd neteweyeke mîrxas e û herdem ji xweavêtina nav talûkeyan jî natirsin. Ew qet naxwazin ku di bin nîrê hinan de bijîn. Serê xwe ji bona kesekî naçemînin. Lê belê di nava xwe de hevûdin xelas dikin. Kesekê ew bi hêsanî neşikandin. Lê ji ber wan dubendiyên di nava xwe de negihîştin armancên xwe. Ji ber wan sedeman, welatê wan her gav di bin piyên hinan de hate perçiqandin."**

Xesiyeta kurdan a herî xerab ew e ku mezinahiya hevûdin napejirînin. Ev xesiyet ji kûrahiyên dîrokê tê û dûr û dirêj gelek bandor li bindestiya wan jî kiriye. Di faşîlbûna serhildanan de ev nexastî heye. Îro jî di bin zilm û zordariya sê hovên xwînmij ên ereb, tirk û faris de dîsa berê wan li neyariya hev e.

Di bin vê xweffiserîtiyê de derketina gelek partiyan, bingeha şerê navbera Berzanî û Telebanî û hevalbendiya Partiya Demokrata Kurdistanê (PDK) ya li gel neyarên kurdan jî careke din fêkiya wê kêşmekêşê ye.

Beriya çêbûna dewleta Ûrartûyan, Asûriyên xwînrêj êrişên dijwar birin ser Naîrî. Naîrî kalikên kurdên başûrê girava Wanê bû. Qralê Asûriyan Tukultî Nînûrtayê 1. (13. 2. 1244-1208) di kitêbeke xwe de wiha dibêje: "Min 51 bajarên wan wêran kirin û 40 qralên wan jî dîl girtin". Pirsra ku tê hişê mirov ev e: Gelo di vê herêma berteng de hebûna 40

heb qralan çawa dikare bête îfadekirin? Li vir baş xuya ye ku her rêşekî kurdan wê çaxê jî bi serê xwe hukumran bûye.

Nivîskarê Şerefnameyê Şerefexan Begê Bitlîsî di berhema xwe ya beriya 400 salan, di "Dîroka Kurdan" de bi kêmasî cih daye 50 xanedanên kurdan. Piraniya wan cuda cuda dijîn û yek ji wan serdestiya yekî din nas nake. Yên ku li navenda Kurdistanê rûdiniştin, mîrên Hekariyan ê Botan û yê Behdînanê nêzîkî 300 salan dijminahiya hevûdin kirin, mîrên hevûdin kuştin û bi terş û talana hevûdin mijûl bûn. Her sê jî di nava împaratoriya Osmanî de nivîsberî xwe bûn, çavên wan jî dijminî zêdetir li ser hev bûn.

Di dûmahiya qirnê 17'an de Seydayê Xanî jî dîsa ji wê rewşa ne baş re gazindên xwe dike û nerazîbûna xwe bi van peyvên giranbûha nîşan dide. "*Lew pêk ve hemîşe bêtifaq in Daîm bi temerrid û şîqaq in*"

Di serhildanên 150 salên paşîn de jî dîwarê xiyanetê bi destên hin kurdên xulam û xwefiroş hate nijîn. Xencera nav milên Ebdurehman Begê Babanî ji aliyê birayê wî Xalid Paşa; ya Mehmet Begê Rewandîzî, bi destê mirovê wî yê oldar Hatî Efendî; ya Bedirxan Begê jî ji hêla biraziyê wî Yêzdan şerhatin çikandin. Ev tenê çendek in ji wan xiyanetên paletiya biyanan.

Li vir temaşe bikin nivîskarê "Mezopotamya û li Kurdistanê gereke nependî" Soane (sala 1912'an Londra) çi dibêje: "Kurd neteweyeke mîrxas e û herdem ji xweavêtina nav talûkeyan jî natirsin. Ew qet naxwazin ku di bin nîrê hinan de bijîn. Serê xwe ji bona kesekî naçemînin. Lê belê di nava xwe de hevûdin xelas dikin. Kesekê ew bi hêsanî neşikandin. Lê ji ber wan dubendiyên di nava xwe de negihîştin armancên xwe. Ji ber wan sedeman, welatê wan her gav di bin piyên hinan de hate perçiqandin."

Va ye-nêzîkî mehekê ye 35 hezar leşkerê tirk di herêma Behdînanê de ye. Di dilê xwe de çûne ku gerîlayên Bakur ji wê deverê derxin û êrişên wan bidin sekinandin. Lê xwe ji kuştina şivan û gavanên Başûr jî nadin paş û wan bi kirêta-hî dikujin.

Lê mixabin Birêz Mesûd Berzanî careke din berê xwe daye Telebanî ka dê bi qasî pêngavekê bikeve pêşiya wî an na. Birêz Berzanî carekê jî xwe napirse ka ew komara tirk a ku 20 milyon birayên wî nas nekirî, di salekê de bi hezaran gund wêran kiriyê û li dora 2 milyon însan ên bêgûneh derberder kirî, çawan dibe dostê wî? Yên ku li Kurdistanê mezînan ev e 70 sal e zimanê kurdî qedexeyê kirine ji bo çi pirtûkan didin zarokên Zaxoyî û Dihokîyan? Li hemberî xwîna gundiyên Başûr û gerîla, wergirtina çend torbe savar û meqerme ma ne şerm e? Îro ne roja dijminahî dubendî û birakujiyê ye. Îro roja tifaqê, biratiyê û yekîtiyê ye. Çi Birêz Me-

sûd Berzanî, çi jî Birêz Celal Telebanî hewce ye berjewendiyên xwe yên şexsî û malbatî nedin pêşiya yên neteweyî, pêdivî ye di demeke kurt de ji wê rika kurde-wariyê bêne xwarê. Enqere ji wan re nabe yar. Ger komara tirk yarîti jî wan re kiribûya wê ji yên ku 70 sal e li ser tixûbên Yewnan, Bûlxa, Çeneqelê, Qorê û Qibrîsê bi hezaran şehîd di ber wan de didan re wê bikirana.

Dîrok dibêje 3000 sal beriya niha, heta ku Naîriyên Başûr û Ûrartûyên Bakur bi hev re nebûn tifaq û konfederasyon çenekirin, xurt nebûn û li hemberî Asûriyan nesekinîn. Mixabin neviyên Naîriyan ên îro li Behdînan in, bi qasî kalikên xwe nîrx nadin tifaqê.

Hêviya me careke din jî tifaq, biratiyê û dostaniya hemû kurdan e. Jixwe ji wê pê ve tu riyên din jî nîn in. Ez nivîsa xwe bi gotineke pêşiyê diqedînim: "Rih dibe bihost, dijmin nabe dost"

Î. CÛLEMÊRGÎ

Li Rûsyayê  
Axîneke bi kurdî:  
**Rojnameya  
AXÎNA  
WELAT**

Rojname bi giranî  
li ser nûçe û  
nirxandinên siyasî  
disekine. Lê rûpelên  
cihê wekî çand,  
ziman, wêje, dîrok û  
hwd. jî hene. Di bin  
logoyê de  
cumleyeke bi kurdî  
heye ku ew jî  
nêrîna rojnameyê  
nişan dide: "Her tişt  
ji bo yekîtiya  
neteweyî."

Mirov gelek carî di  
sohetên kurdan  
de rastî axaftina  
ku li ser kêmasiyên civa-  
ka kurdan çêdibin, tê. Di  
nava van kêmasiyan de  
çend heb hene ku bingeha  
civaka modern teşkil  
dikin. Yek ji van jî,  
Çapemenî ya Çapemeniya  
kurdan di sala  
1898'an de bi rojnameya  
Kurdistan dest pê kir.  
Îro jî li welatekî biyan, li  
Rûsyayê rojnameyekê 15



rojî bi navê Axîna Welat  
dest bi weşanê kir.  
Rojnameya Axîna  
Welat, hejmara xwe ya  
yekemîn di nava meha  
reşemiyê de derxist. He-  
ta vê gavê 3 hejmarê Ax-  
îna Welat derketine.  
Rojname ji 16 rûpelan  
pêk tê, lê ji van 12 rûpel  
xwerû bi kurdî û 4 rûpel  
jî bi zimanê rûsî ne.  
Di redaksiyona rojna-  
meyê de nivîskarê kurd  
ê ku tê naskirin Bavê  
Nazê jî heye, ji bilî wî di  
redaksiyonê de ev kes

hene: Korda Mad, Dil-  
xaz, S. Dilpolo, Hesen  
Şêxo, Ç. Reş û Îşxane  
Miro.  
Rojname bi giranî li  
ser nûçe û nirxandinên  
siyasî disekine. Lê rû-  
pelên cihê wekî çand, zi-  
man, wêje, dîrok û hwd.  
jî hene. Di qapaxa rojna-  
meyê de li bin logoyê  
cumleyeke bi kurdî heye  
ku ew jî nêrîna rojna-  
meyê nişan dide. Ev  
cumle wiha ye: "Her tişt  
ji bo yekîtiya neteweyî."  
SUUT KILIÇ

**Banga Yekîtiya Mamosteyên Kurd (YMK)**

VEXWENDNAME

Hevalên birêz!  
Mamosteyên kurd!  
Sala Ehmedê Xanî, sala zimanê kurdî, sala avakirina saziyên netewe-  
yî yên kurdî û bi giştî sala gelê kurd 95, bi germiya şoreşa serxwebûn û  
azadiyê geş dibe.


Êdî gelê kurd gavên dawî ber bi  
dewletbûnê ve davêje. Hevsarê  
dîrokê girtiye dest xwe û diki-  
şîne ser mirovahiya hem-  
dem. Herkesê kurd, her-  
kesê mirovperwer di  
cihê xwe de, di nava  
sazi û yekîtiya xwe de,  
di vê pêşveçûna pîroz  
de dibe xwedî par.

Mamosteyê kurd jî,  
di nava yekîtiya xwe  
YMK'ê de deynê dî-  
rokê bi berpirsiyarî hil-  
digire.

Yekîtiya Mamosteyên  
Kurd (YMK) we bi germiya  
şoreşê silav dixe û jî dil û can  
we vedixwîne kongreya xwe ya a-  
warte.

Mêjû: 11.06.1995  
Saet: 10.30  
Navnîşana cih: Faulenstr. 9 Bremen  
Komela Hevalî  
Tel: 0421-1692646

Têbînî: Roja lidarxistina kongreyê pêşî wekî 13.5.1995 hatibû flankirin.  
Lê pişt re ev hate texîrkirin.



Yekîtiya Mamosteyên  
Kurd (YMK)  
Komîteya kargêr

**Pêşbînî çîroknûs le Xewnî Sêyem da**

Xewin rengdanewey jiyani  
mirov e, mirove xwapê-  
dawekan bawer im tu car  
xewnî nacor û dijwar nabête  
miwanyan. Em  
çîroknûşesman yek lew  
mirovane ye be degmen nebêt  
ne bawer im "xoşî" le xewin û  
jiyanî da be miwanî bêbêt.  
Piştî raperîniş, em yekêke le  
mirove "bê rengkan," lewra  
ew hêle biyaniye berdeyamî  
werdegrêt. Pêdeçê em û  
"xoşî" dû hêlî terîb bin! Her  
çonêk bêt, xewin lay mirovî  
runakbîr û be ezmûn pêşbînî  
ye, pêşbîniyekî zanistîş, em  
boçûne ta radeyekî zor zanistî  
hawçerx pey pê birduwe û  
deyselmênêt ke xewnî  
roşinbîran û be ezmûnan pey-  
wendiyar be diyardey "xeyalî  
û xûrafîyewe" niye û bo xoyan  
pêşbînî mezin in. Êxo Heme  
Kerîm Arifîş le me be der niye  
û biwardinî êwaranî da xewnî  
naxoşî tûş bûbêt.  
Ew le amêzî xewnî sêyem  
da, êmeş debate nêw cihanî

xewin amêze seyr û  
semerekey xoyewe. Le  
despêkêkî kurd da be  
baskirdinî diyardey xewin  
demanbate nêw cihanî ew  
"xewn-jîyan" ew e ke pêwîst e  
be hev ra le serî ramênin, be  
rêgay bir û hoş şîbikewewe.  
Lêre da, le gêranewey xewnî  
naxoş da, be bekarhênanêkî  
cwan û sadey diyardeyekî  
bawî kurdewarîman xistineser  
"tewzîf"êkî le barî xemlan-  
duwe, (ke gêramewe bo  
berdê, darê dîwarêkî  
degêrimewe....) Êstaş le nêw  
kurdewarî da "eger be rêjeyekî  
kemîş bêt" em diyarde ye  
mawe û le naw zor kesan da  
ew gêranewe ye berdeyam e.  
Nuha jî le awayekanî  
Kurdistan ke zarokêk be  
dayikî delêt; em şew xewêkî  
naxoş im bîni bersivî dayikî  
weha ye: "Role biro bo  
berdêk, darêk, awî kaniyek,  
hwd. bigêrewe. Çîroknûs em  
dabe be dem destdane" zewî,  
wîrd xwêndin û fikirdinewe" be  
cwanî berceste dekat.

"Hest dekem zorim zerer le  
negêranewey xewnekanim kir-  
duwe" bêguman ew zerere her  
be dwamanewe ye û wekû  
sêber lêman ciya nabêtewe,  
ême le hemû rojgarekan da  
nemantwanîwe xewnekanman  
bigêrinewe, ta waş bin nat-  
wanîn biyan gêrinewe. Lê ew  
hestî bew bare kirduwe, lewra  
em careyan xewnî çarenûs  
sazî xoy be, "dengî berz"  
degêrêtewe.  
Şwênî xewneke, Şarêk e,  
belam çon şarêk "ta çaw heter  
ka wêrane" hêwir bûn tiyay da  
tine û mehale jî, dengî  
"bayeqûş" şay dangan e. Cige  
le maneş dîmenî cwan û  
bedew berevajî zagonî jîyan  
bil û dizêw denwênin, êşqan  
zorakî esp û "ka" zorakî  
"çewrî" segane. Em e  
dîmenêkî sertapayî ew şare  
ye ke ew bîniwiyetî, yan rast tir  
ke êmeş hemûman bîniw-  
mane, lê ême ta êstaş bo aw,  
dar û berdekanî degêrinewe,  
herçî ew e vê carê "be dengî  
berz" be gwêy hemwanî da

dedat.  
Lew şare da, lew parçeyey  
niştîmane kulolekeman da:  
Qifilî "şorişgêran" hereşe le  
hemû zarekî kurdaney heqwej  
dekat, kirduyne be goristanî  
dad û maf xwanêkî tirsî-  
nakiyan bo xelik raxistuwe, îdî  
eme ne qiyamet e!!  
"Sergerdan û bê mebest"  
hemwaniyan we dway xo xist  
û "rengî mebestiyar" be dû  
rengî nacor feramoş kird.  
Welê kes nebû ew nihêniye,  
ew girê kwêreya man bo  
bikatewe, bo bê rengan  
cehenemîn û naçne  
beheştewe? Êstaş le nihêni  
"vîza"y ew rengane halî  
nebûm ke berew biheştî bex-  
tewerî be rengî "kesk û zerd"  
ew e le şeqey balyan deda!  
diyar e çîroknûs bo xoy yek  
lew "cehanemeyane" ye û  
wekî hezaran "damawî" tir bê  
reng e.  
Karesatî gewre lêre da ye  
ke "ba tûndeke" heldekat û  
baran debarêt. Bo ême baran  
armanç û mebest e, lê nek ew

baraney lafawêkî samdar  
heldestênê û "be balay  
minaran da be hewa da deçê"  
le songey em bare na le bare  
da, mirove rengînekan (bê  
rengan-gel) be cêdêlin û  
deron, kesîş nazanê berew  
kwê û le kam bender da  
lenger degrin. Bo kardanewey  
ew kare le naw gel da pêşbînî  
ew "demrêj" e dekrêt û wextîşî  
hatuwe, no mang û no rojî be  
ziyadewe tewaw kirduwe,  
lewma ew (mindal-hawar) e  
gerek e le dayik bêt, demrêjî  
hawar be rûy "xo rengkir-  
duwan" da bidat her ew hawar  
e ême û çîroknûsîş le xew  
radeperênê ke xozge le  
"xewnî sêyem" da jî, herweha  
debû û be dem ew hawarewe  
dadeçelekî. Pêwîst e hawarêk  
gomî bêdengîman bêhelwêstî-  
man yan çî naw denên,  
bişeqênêt û lew xewne qûle  
ramançelekênêt...  
Ewsa be hev ra şayet-  
manêkî be heq dênin.

SÎRWAN REHÎM

Zarokan li biniya gund di nava lodan de çav-girtonek dileyistin. Ewqas biliya leyistikê bûbûn, dinya jî xera bibûya ne xema wan bû. Salo piştî leyistika çavgirtonekê ji zarokan re got: "Hevalino, em îcar jî çala gur bileyizin." Ji zarokan hinekan, "na" hinek jî "belê" gotin. Wê demê ji nava wan Binevş derket û ev pêşniyaz ji wan re anî:

- Ka werin, em bijimêrin. Ên dibêjin "erê" û yên dibêjin "na" bila kifş bibe. Kîjan pir bin li gorî wê em lîstika xwe bileyizin.

Bahoz xwest ku jimartin jî wekî leyistikê were çêkirin û ji zarokan re got:

- Zarokino li dor min kom bibin û bi destên hev bigirin. Ezê çîvanokekê bibêjim. Min navê kê got bila ew derkeve rastê û bila fikra xwe bibêje.

Ev fikra Bahoz zehf

# ZAROK Û ŞER

li xweşa zarokan hat. Tavilê rabûn bi destên hev girtin û li dora Bahoz helqeyek çêkirin. Zarok li dorê digeryan û Bahoz jî dest bi gotina çîvanoka xwe kir:

*Siwar bû li kerê Çû bênderê av vexwar, neda kerê Da dû te mişk û maran*

*Arvanê koran îcar dora kê? Sosin derket Qaso derket Ma Hulo Hulo derkeve rastê*

Bi xwestina Bahoz Hulo derkete holê û fikra xwe jê re got. Bi vî awayî ji hemû zarokan hate pirsîn ku kîjan leyistikê dixwazin.

Di dawiyê de daxwaziya leyistina "çala gur" derket. Îcar zarok dest bi leyistina wê kirin. Sedo bû gur, Binevş bû dayik û zarokên din jî bûn berxên wê.

Hemû berx yeko yeko li dû hev rêz bûn

û bi piştê hev girtin. Diya wan jî li pêşiyê bû. Gur her cara ku êrîştî wan dike, berxekê direvîne, dibe. Kîjan berxê dibe, dike çala xwe.

Gulê hîn çar salî bû. Sedo dev û çavên xwe xwaro maro dikir, mîna gur tevdiqerîya. Dema diqerîya, Gulê jê ditirsiya. Û wiha digot: "Dayê min nede gur." Zarok bi vî rewşa Gulê dikenyan.

Leyistika zarokan didomiya, ji nişka ve dengên tanq û topan hat. Lê zarok ji wan dangan re ne biyan (xerîb) bûn. Di nav xwe de rêxistinek çêkiribûn, hev şîret kiribûn. Seroka wan jî Binevş bû. Gava dengê guleyan nêzik bûn Binevş nola fermandarekê ew li hev civandin. Û gote wan: "Zarokino keviran berhev bikin û xwe veşêrin. Lê xwe baş veşêrin ha. Leşkerên

romê gava we bibînin wê guleyan berî we bidin. Çaxê hatin nava gund keviran biavêjin wan. Serê wan bişkînin."

Zarokan gişt bêyî dengkirinê lê guhdarî kirin. Pişt re Gulê li Binevşê deng kir: "Binevş ez xwe venaşêrim." Zarokan gişt bi awayekî heyirî lê mêze kirin. Binevşê jê pirsî: "Çima Gulê, ma leşkerên romê te nakujin?" Gulê lê vegerrand; hem jî bi awayekî devbikenî: "Ez diherim çeka (sîleha) bavê xwe tînim. Ezê jî guleyan berdim wan."

Bi bersiva Gulê hemû zarok kenyan. Binevşê ji Gulê re got: "Gulê tu di leyistikê de ji gur tirsîyayî û tu ji leşkeran natirsî. Lê leşker ji guran jî hartirin".

Gulê li ser vî pirsê hinek sekinî, dû re wiha got: "Apê min gote, kî ji leşkerên romê



bitirse ew zû tê kuştin. Ez naxwazim bimirim." Piştî axaftina wê bêdengî kete nava zarokan. Demek bi şûn de Binevş deng li wan kir: "Haydê hevalino, belav bibin. Ji bîr mekin gere leşker ji ber kevirên me birevin û nekevîne nava gund ha. We fêm kir?"

Wê rojê leşkeran êrîştî ser gund kirin. Hemû xanî dan ber guleyên top û tivin-

gan. Dibistan û mizgefta gund jî şewitandin. Zarokan wê rojê hemû kevirên di pêş û berîkên xwe de avêtibûn leşkeran. Binevş û Sedo ji ber gulebaranê bêdeng mabûn.

Dotira rojê rojname û TV gotin ku terorîstan girtine ser gund û jin û zarokan kuştine. Agir berdane gund.

ROTÎNDA  
YETKÎNER

## N A M E Y Ê N X W E N D E V A N A N

### Tiştê min jê re got besî wî ye!

min jê re got: 'Dizo, dizo, dizo' û ez hatim."

Gundî jê re dibêjin: "Ka alavê te birine, te jê nestand."

Dibêje: "Na tiştê min jê re got besî wî ye."

Çiya Mazî

### Vejna zimanekî paqlî

Êrîşa ku artêşa tirk li başûrê Kurdistanê dike tiştêkî pir bêfeyde ye. Lewre PKK ne tiştêkî biçûk e. Bi milyonan gelê kurd destê xwe dayê û bi rê xistiye. Bi van êrîşan naqede.

Li gundekî Kurdistanê diz ketiye mala mirovekî, dema pê dihesin dike hawar û bi şopa diz dikevin. Xwediyê malê li pêşiyê digihîje diz, çend gotinan jê re dike û vedigere. Gundiyên wî li ser rê sekinîne, li benda wî ne. Dema tê cem wan, gundî jê dipirsîn: "Ka te çi kir?" Xwediyê malê dibêje: "Min diz zeft kir û ez li pêşiya wî sekinîm

Wekî ku mirovekî nezan û rohnîya çavên wî kêr di rêçekê de bimeşe û leqayî elmasekî bibe, xwe xwar bike, rahêjê elmas lê binihêre belê çavên wî baş nebîne tiştêkî jî fêm neke û bavêje.

Pirsgirêka herî girîng jî ev e ku zimanê zikmakî qet bala civaka kurd naqîşîne.

Civaka kurd jî radihêjê ziman qet ber bi serî ve naçe û davêje. Belê ka xwezî ew mirovê nezan û şewqa çavan kêr dema elmas dît tê de bigîhiştta ku çi qas nixê wî mezin e û bizanibûya ku ew parçeyê made yê biçûk rizgariya bedena wî ye, ma tu car davêt?

Belê civaka kurd jî ka xwezî bizanibûya avêtina ziman hilweşandina bedenê ye, daxwaza neyarê ziman diza herî mezin e. Ji ber vî yekê divê em hemû kesên di nava civaka kurd de me cih standiye û me li ser navê civaka kurd zimanê zikmakî, peywirên xwe yên şexsî pêk neanîne, pêwîst e em van hevokan ji bîr mekin û xebat û lêkolîn ên girîng pêk bînin.

Hemû xebatkar û peywirdarên rojnameya Welatê Me ez we ji can ji dil pîroz dikim, ji bo pêkanîna peywira we ya girîng silavên şoreşgerî ji we re bi rê dikim.

Kedkar Çîn/ Bursa

### Welatê Me û TV-MED'ê

Silav li we gelî xebatkarên Welatê Me û TV-MED'ê ji bo ku we rojnameyekê û TV'yeke bi zimanê kurdî derxistiye, we em pir kêfxweş kirin û ji bo vî yekê ez we hevalan pîroz dikim. Îsal ji bo me kurdan serkeftin nêzîktir e. TV'ya MED'ê jî dest bi weşan û xebatê kir û ji ber vî jî em pir kêfxweş in.

Ez dixwazim ku li vir mesajekê bidim gelê me: Gelî mirovên kurd, xwişk û birano, gerek e em ji bo zimanekî delal û zelal tim û tim bi kurdî biaxivin û binivîsin. Ez bawer im ku emê di sala

1995'an de zimanê kurdî fireh û zelal bikin.

Dr. Delîl Firat  
Frankfurt

### Em cejna we pîroz dikin

geş bibe. Ev geşbûn wê têkoşîna me bide nasîn.

Em cejna Parlementoya li Derve, Yenî Polîtîka, TV-MED'ê û Welatê Me pîroz dikin.

Merwan Herekol / Êlih

### Dawiya harbûnê

Silav li we xebatkarên rojnameya Welatê Me. Heta vêga me rojname û kovarên çapemeniya tirk dixwendin. Rojnameyên derew û jehriyê. Rûpelên wan tijî derew in. Bi van derewan dinya li me dikirin zindan. Lê, di nav ewrê reş û tarî de stêrkek derket. Rastiyek heye ku komara tirk ji ronahiyê hez nake. Divêt gelê kurd û rojnamevanên kurd dest bidin hev, ji bo ku ew stêrk

Karê we xebatkarên Welatê Me dijwar e, êdî dijmin harbûye, li dora we digere. Em dizanin ku dawiya harbûnê mirin e. Mirina dijmin ne dûr e. TV-MED rûreşiyên wan derdixîne holê, ji bo wê dilê wan bikul e. Bila kula giran bi canê wan be.

Silav ji xebatkarên Welatê Me re.

Eyüp Demir / Enqere

Hefiya din, min xwest ku li ser pêwistiya karê wergerê çend tiştan bibêjim, dû re jî gotinê bînim ser kêmasiyên me yên ku di vî warî de derdikevin holê. Niha jî ezê li ser van kêmasiyan rawestim û hin pêşniyazan pêşkêş bikim.

Pêşî divê bête zanîn ku wergera edebî ye mijara vê nivîsê. Bes, tevî vê yekê eger hin qeydeyên bingehîn ên vî karî, rind neyên zanîn û pêkanîn, ne mumkun e ku wergera berhemên jirêzê (ne edebî) jî baş bête kirin. Çûnkî di warê nivîsandina akademîk de kurdî (bi taybetî jî zaravayên kurmançî û kirdkî) zêde nehatine bikaranîn.

Li aliyê din jî bo wergereke tîkûz, ji xeynî niqteyên bingehîn, gelek detayên biçûk (lê girîng) jî hene. Dîsa jî ya baş ew e ku em pêşî serê xwe bi qeydeyên bingehîn re biêşînin, hevûdin serwest bikin, dû re dest biavêjin detayan.

Em werin ser van kêmasî û çewtiyan. Ji ber nemusaîtûna cihê ezê, tenê xal bi xal bi awayekî gelemperî wan li jê rêz bikim. Berhemên ku li kurdî hatine wergerandin û weşandin bi kurtî jî ber van sebebên li jê nagihin encameke ku tê hêvîkirin:



## Jî Welatê Me

Mazhar GÜNBAT

### Li ser wergerê em çi zanin?

1. Li ser wergerê, wergêr ne xwedî zanîneke kûr û akademîk in. Yanî ji ilmê wergêrê zêde ne agahdar in.

2. Her kes li gor mijara ku li ser pispore wergêrê nake. Kesekî ku tenê pispore romanê ye hem şîir, hem roman, hem çîrok, hem şano, hem jî hin cureyên din ên edebî werdigêrin.

3. Ji eslê berhemê werger nayê kirin. Mesela pirtûkeke ku eslê wê inglîzî ye û li tirkî hatiyê wergerandin, ji wergera wê ya tirkî li kurdî tê wergerandin.

4. Yê wergerê dikin herdu zimanan (zimanên jêwerger û lêwerger) ji hemû hêlan ve baş nizanin.

5. Werger pir bi lez û bez tê kirin.

6. Beriya wergerandinê,

berhem baş nayê xwendin.

7. Cureya berhemê, pêla wê, usluba nivîskar, dema ku berhem hatiyê afirandin û hwd. baş nayên zanîn, li ser wan niqteyan lêgerînên dorfireh nayên kirin.

8. Bi navê wergera serbest jî eslê wergerê pir tê dûrketin an jî berevajiyê wê, werger peyv bi peyv tê kirin.

9. Lêkolîn û lêgerînên ku pispore biyan di vî warî de pêk anîne, têr nayên xwendin û ji tecrûbeya wan nayê îstîfadekirin.

Ji bo ku wergereke zêde xerab çênebe, ji xeynî jiholêrakirina wan xalên jorîn, pêwist e wergêr hem zêde di bin tesîra zimanê jêwerger de nemîne hem jî di zimanê lêwergerê de bide fêmkirin ku ew berhem ji zimanekî din hatiyê

wergerandin. Helbet ji bo vê jî xebateke pir hesas û birêkûpêk lazim e.

Dawî divê bête zanîn ku ew kêmasî û çewtiyên li jor tev bi hev re li cem wergêrekî nehatine tesbîtkirin, ji ber vê yekê jî pêwist e her werger van gotinan çawa ku jê re hatibin gotin nenirxîne. Feqet li cem her yek ji wan, ji xalên jorîn çend hebek xwe didin xuyakirin. Bêguman ji bo ku zimanê kurdî zirarê bibîne, hewce nake ku wergêrek wan çewtiyan giş bike; çend çewtî û kêmasiyên li jor tenê bes in ji bo ku zimanê kurdî jî wergerê zirarekî mezin bibîne. Ji ber vî qasî, eger çewtî nehatî fêmkirin, minê pêşniyaz bikara ku heta çend mehan an jî heta salekê kes berhemên edebî wernegerîne kurdî, çûnkî eger ev kar baş neyê pêkanîn, bi rastî jî zirarê ku dagirkeran bi deh salan nekarîne bidine zimanê me, emê di demeke kin de karibin bidinê. Ez pêşniyaza rawestandina vî karî nakim, feqet qet nebe eleqedarên vî warî vedixwînim ku li ser wergêrê lêgerînan bikin, bi awayên cur bi cur gengeşîyan bikin.

Gotina dawî; ji wergêrê bêhtir, gotûbêj û munaqeseyên li ser wergerê ji bo me pêwist in.

### "Feyza me weke Nîl e Lê em Dicle û Firat in"

Gelê me ji her salî bêhtir îsal jiyana xwe û têkoşîna xwe bihêz, ber bi serkeftinê ve dibe.

Em bi vê hêz û dilşadiyê cejna gelê xwe yê ku li ber xwe dide pîroz dikin û em hêvî dikin emê cejnên xweş di welatekî azad û serbixwe de pîroz bikin.

Navenda Çanda Mezopotamya-Stenbol

Şaxê Hewlêrê

Şaxê Amedê

Şaxê Edenê

Şaxê Îzmîrê

Kovara Rewşenê

## Tirkiye ji bo me bûye zindaneke mezin

Şerê xwîndar ku ev deh sal e didome, li ser Tirkiyeyê bû barekî giran û wê hîn girantir jî bibe. Hûn dizanin wê nîfşên me, her çiqas mirovahî dejenere jî bibe, kirinên di vî deh salî de jî bîr nekin. Wê bi sedan romanên vî şerî bîne nivîsandin, bi sedan filmên wê bîne çêkirin. Ji niha ve lorîk û stranên vî şerî derketine meydanê. Mirovahî nabexşîne, çendî bixuye ku beşxandiyê jî.

...Em bîn ser Almanayê. Hîtler û Hîtlerî sîcê dinyayê yê tewrî mezin kirin. Mirovahî hîna ji ber wê, wijdana xwe safî nekir, piştî xwe rast nekir, nexweş ket. Mirovahî ne mirovahiya berê ye. Tenê ji ber Şerê Cihanê yê 2. hêza afirîner a mirovahiyê birîndar bû. Almanya, ne ji karker, nivîskarên ku pirtûkên wan hatin şewitandin û zana û hunermendan bûya, ku li dijî Hîtler derketine, ji lanetkirina miro-

vahiyê nedifilîtî. Ku fro gelê Alman hinek dilrihet be, dikare li rûyê mirovahiyê binihêre, ji ber karker, rewşenbîr, zana û hunermendan e, ku bi gorîkirina canên xwe li dijî Hîtler rabûne.

"Heke ne ji Thomas Man, Henrick Man, Stefan Zweig, Brecht, Erick Maria Remarque û yê mîna wan bûna, ku li hemberî Hîtler şer kirin, fro gelê alman wiha bi seriyekî bilind di nava mirovahiyê de nedigeri-

ya. Dîsa jî ne mumkun e ku di kûrahiyekê de, di quncikekî dilê wan de pêjneke (hîsiyateke) şermê nîn be." Wê demokrat, nivîskar, zan-yarên li Tirkiyeyê vî şerê xwîndar, ku bi Tirkiyeyê nakeve, lê ku qet pê nakeve biqedînin. Em neçar in ku vî şerê xwîndar û gemaî biqedînin.

Nivîsên min ji gelê me re bang in. Bi taybetî deng li dayikên li rojhilat û rojava dikim ku zarokên wan di şer de

mirine. Ev şer pirtir dilên we şewitand. Ez gazî her kesî dikim. Dadgerên birêz, ez gazî we jî dikim. Werin hûn jî bikevin nava kesên ku dixwazin vî şerî bidine sekandin. Ev welat, ê me giştan e û layiq e ku di dîroka mirovahiyê de pir bijî. Hem jî bi heysiyeta xwe. Em ji bîr nekin ku heysiyeta mirovên welatekî bi qandî axa wî welatî pîroz e.

WERGER:  
ZANA FARQÎNÎ

### AGAHİYÊN ABONETIYÊ

Min Welatê Me Divê

	LI Hundir	LI Derve
<input type="checkbox"/> 3 Meh	<input type="checkbox"/> 550.000 TL	<input type="checkbox"/> 45 DM
<input type="checkbox"/> 6 Meh	<input type="checkbox"/> 1.000.000 TL	<input type="checkbox"/> 80 DM
<input type="checkbox"/> 12 Meh	<input type="checkbox"/> 1.800.000 TL	<input type="checkbox"/> 150 DM

#### Bedelê Abonetiyê ez radizînim

LI Tirkiyê - Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti. Yapı-Kredi Parmakkapı Şubesi Hesap No: 1100264-1

LI Derve - Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti. Yapı-Kredi Parmakkapı Şubesi Döviz Tevdiat Hesap No: 3001507-3

NAV û PAŞNAV : .....  
NAVNİŞAN : .....

#### Navnîşana Welatê Me

Ayhan Işık Sok. No:23/3 Beyoğlu/ İST.  
Tel-Fax: 293 53 19 - 245 29 91

## WELATÊ ME

Rojnameya Hefteyî  
(Haftalık Gazete)

Li ser navê  
ROZA Basın ve Yayıncılık  
San. Tic. Ltd. Şti. adina  
Xwedî (Sahibi)  
Aynur BOZKURT

Gerînendeyê Weşanê  
(Yayın Yönetmeni)  
Mazhar GÜNBAT

Berpirsiyarê Karê Nivîsaran  
(Yazışleri Müdürü)  
Metin AKSOY

Berpirsiyarê Nûçeyan  
(Haber Sorumlusu)  
Suut KILIÇ

Redaktor  
Sami TAN

NAVNİŞAN (Adres)  
Ayhan Işık Sok. No:23/3  
Beyoğlu / İSTANBUL


TEL-FAX  
293 53 19 - 245 29 91

ÇAPXANE  
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.

NÜNERİ  
(Temsilcilikler)

Suriye- Jan Dost  
Fener Rojbiyanî  
Berlin- Silêman Sido  
Sîrwan Reşîd  
49-30-69 00 26 95  
Bonn- Ahmet Baračkılıç  
49-228-66 62 49  
Hannover- Selîm Biçûk  
49-5721-813 60  
Hamburg- A.Hekim Gülsûn  
49-40-40 33 88  
München- Mahmut Gergerli  
49-871-670 884  
Badenwürttemberg-  
A. Rahîm Ayaz  
49-75453258  
Swed- Amed Tigris  
46-8-740 69 81  
Amsterdam- Cotyar Zaxoy  
31-20-613 07 66  
Paris- M.S. Ayçiçek  
33-1-48000401  
Atina- Ferhan Zêbarî  
30-13634905  
Bruksel- Medenî Ferho  
32-16-49 07 67

# Tirkiye ji bo me bûye zindaneke mezin



**Me bi van kirinên der-mirovî nekir ku em hew karibin li rûyê mirovahiyê binihêrin? Ji bo ku em masî bigirin me av ziwa nekir? Ev gişt ne encamên ziwakirina avê ne. Me di gel van, mafên mirovan nepelçiqand? Ev şerê xwîndar nebû sedem ku ji 20 milyonî pirtir mirov ji mafên mirovan bêpar bimînin? Me çanda van xakan, xweşikbûna wan, ew nîrxên mirovahiyê nekuşt?**

**N**ivîskarê Kurd Yaşar Kemal careke din derkete hemberî dadgerê DGM'ê. Em ji parêznameya wî ya ku li salona dadgehê xwend beşeke mezin jê werdigêrinin kurdî û diweşînin.

Dadgerên Birêz!  
Ezê li vê derê her wekî ku tê hizirandin, parêziyeke klasîk nekim. Min divê ez çend şaşiyên rast bikim. Di wê danîşînê de mesneta Dozgerê Birêz ne nivîsa min e, lê kurtasî û berevajîkirinên rojnameyên Hürriyet û Milliyetê ne ku xwedêgiravî ji zimanê almanî wergerandine.

Eger dozger pergala daraziyê cidî bigirta, wî karî wiha nedikir, ez bi sūcdarkirinên besêrî û binî dernedixistim pêş we. Qet nebûya wê nivîsa ku di kovara almanî de derketibû bi kesekî bêteref bidaya wergerandin û wisa wî ezê bianîma hemberî we. Wê tiştêkî din jî bikira, wê eslê nivîsê ya bi tirkî jî min bixwesta. Me dev jî wê jî berda, li cem me tê zenkirin ku karê dozger sūcdarkirin e, bila wisa bê zanîn ew jî ne tiştêkî e, dema ku dozger di nivîsa min de li sūc digeriya, pirtûkek bi navê "Azadiya Xweşfadekirinê û Tirkiye" derket, di vê pirtûkê de nivîsên 24 nivîskaran cih distand. Du nivîsên min jî tê de hebûn. Yek jê di kovara

Indexê de derket ku ji kovarên İngiltereyê yê herî bibandor û cidî ye. Yek jî di Der Spiegelê de. Mirovekî, dozgerêkî ku daraziyê cidî bidîta wê bigota ku em li eslê nivîsê jî binihêrin.

Dozgerên birêz! Di nava du saetan de, yanê bi derketina wê re ew dan berhevkirin. Mirovek, çend mirov, çawan dikarin pirtûkeke 140 rûpel di navbera du saetan de bixwînin û bidine berhevkirin, li welatê me tiştên wisa diqewimin ku mirovan diheyirînin, hûn li spehîtiya wî karî binihêrin ku ev pirtûk, ji ber herdu nivîsên min hatine berhevkirin. Parêziya herdu nivîsan jî tê de bû.

Ji bo xwendin, hizirîn, lêgerîn û dîtina hêmana sūcê ku di navbera çend saetan de, di van herdu nivîsan de bê dîtîna divê mirov dahî be, an jî divê nexwendibe...

Çima dozger lez kir, çima zehmet nekir pirtûk bixwîne? Ez dibêjim qey di vir de qestek heye. Ji ber ku wê nîkaribûya bi nivîsa tirkî ez sūcdar bikirama lewma. Hûnê bibêjin çî xereza dozger bi we heye, kes vê nizane. Ev pêncî sal in ku ez nivîskar im. Pêncî sal in jî ez nivîskarekî bi wî awayî me. Ji ber ku Tirkiye tu gavê nebû demokrat, Tirkiye ji me tevan re bû girtîgeheke mezin. Girtîgeheke hûn

biçûktir ji bo min ferq nake.

Ezê çend nimûneyan ji wergerên rojnameyan bidim, qaşo werger in. Şaşiyek heta ku derê çûye. Sernava nivîsa di Der Spiegelê de di Milliyetê de 'Sefera Viran' û di Hürriyetê de 'Kampanyaya Viran' derketiye. Di navbera wan de cihêtiyeke sosret heye. Di cihekê de jî rojname wekî 'Şibandina Vîetnamê' werger kiriye. Ne rast e, min di nivîsê de got: Gel Amerika ji Vîetnamê, Sovyetan ji Efganîstanê qewirandin. Min xwest bibêjim ku, bi şer mirov nagihîje derekê.

Ji nivîsê beşeke din: Ez dibêjim ku "girtina masiyan bi ziwakirina avê" rojname dibêjin "ziwakirina deryayê." Hûnê bibêjin ma derya jî ne av e? Belê derya jî av e, lê şor e. Generalek gelo nizane ku derya nayê ziwakirin? Zane. Erê, ma gotina generalekî jî tê berevajîkirin?

Li welatekî ku hîç daristana wê nemaye, li Anadoluya Rojhilat a çol û pesar, şewitandina 10 milyon hektar daristan ne guneh û hem jî ne

sūcêkî ji sūcên herî mezin e, ji bo ku çend gerîla, çend şivanan bişewitînin? Vê dewletê sūcêkî mezin kir. Bû sebebê ji holêrabûna hemû daristanên Anadoluyê.... bû sebebê qedîna wan. Emê hîna li jiyane van bibînin. Emê hîna li jiyane bin, bibînin ku tenê ji ber vê yekê lehî, birçibûn û xizanî çawa Anadoluyê bidine ber xwe.

Şewitandina daristanan ne rast e? Ji ber vê yekê gelo mafê min nîn e ku ez dewletê sūcdar bikim?

Wekî din gelo hemû dinyayê 1800 cinayetên "kiryar nediyar" (faîlî meçhûl) nebihîst, rojname nenivîsandin? Tirkiye wekî dewleta îşkenceker a herî mezin nehate ragihandin? Wekî bayeke bijehr û zalim bi ser gel ve neçû? Bi hezaran gund nehatin şewitandin, her çiqas gel qîriya û got bila zilma te zêde bibe ku tu zû zewalê bibinî? Lê nexebitîn ku mîna Ruandayê dinyayeke tije birçibûn û xizanî biafirînin? Sê milyon mirov ji cih û warên xwe nehatin kirin, mirovên tazî, birçî, xizan li

bajarên rojava û başûr tije nebûn; li ber sermayê, li binê baranê neman? Ji me kirî emê, bi vê çûnê nebin rûşeya sedsalê. Gelo bi wî awayî şerefa welatekî nehate bînpêkirin?

Me bi van kirinên der-mirovî nekir ku em hew karibin li rûyê mirovahiyê binihêrin? Ji bo ku em masî bigirin me av ziwa nekir? Ev gişt ne encamên ziwakirina avê ne. Me di gel van, mafên mirovan nepelçiqand? Ev şerê xwîndar nebû sedem ku ji 20 milyonî pirtir mirov ji mafên mirovan bêpar bimînin? Me çanda van xakan, xweşikbûna wan, ew nîrxên mirovahiyê nekuşt?

Di vê çerxê de ew tiştên ku me li hemberî mirovahiyê pêk anîn, gelo dikarin bîn bexşandin? Di serî de jî ew kirinên ku me bi welatên xwe kirine, gelo nîfşên ku bîn wê ji bîr bikin? Wê ji me, ji çerxa me şerm nekin?

Ez gotinên xwe, bi parçeyê nivîsa xwe ya ji pirtûka "Azadiya Xweşfadekirinê û Tirkiye" diqedînim.

Dûmahîk rûpel 15

elnewêrek

